

## Çîrçîrok çi ye?

Çîrçîrok yek ji şaxên girîng ên wêjeya gelêrî ye, afirandin û berhemên gel e. Dîroka wan ne diyar e. Bi devkî hezar û hezar salan heya roja me ya îro hatine. Di çîrokan de, serboriyên lehengên derasayî tên vegotin... ***Yasemîn Elban / R.7***



## Kew ne dijminê serê xwe ye!

Di civata kurdan de kew, nemaze kewê/a gozel bûye sembola dengxweşî, nazelîn, kubarî û desthilanînê û hin wesfên din ên neyînî. Loma jî ilusrationa hin stranên Mihemed Arifê Cizîrî wek a Qasimê Meyrê... ***Seyidxan Anter / R.10***



## Bijarteyek ji albûmên salê

Ji ber pandemiyê sala 2020'an hem li cîhanê û hem li Kurdistanê saleke zor û zehmet bû. Gelek xebatên çandî û hunerî, bi taybetî jî muzîk, bi rêk û pêk nehatin kirin, tenê beşeke biçûk bi awayekî online pêk hat... ***Gokçe Selîm / R.15***


# xwebûn

28 KANÛN 2020 - 3 ÇILE 2021 HEJMAR: 54 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Bila bibe sala xweşî û azadiyê

Sala 2020'an bi nexweşiya koronayê derbas bû û em ketin saleke nû. Vê nexweşiyê bandor li seranserê cîhanê kir. Hemû cîhan li hemberî koronayê têkoşiya û di demeke wiha de dewleta tirk jî herî zêde li hemberî kurdan têkoşiya! Nivîskara rojnameya me Mizgîn Ronak di nivîsa xwe de wiha dibêje:

"Way me salek wiha qedand jî. Bêguman di nav vî fîlmê ku her kesê kiriye xwediyê yekrû de jî faşîzan nesekinî û îspat kir ku ew tu carî, di nav rewşên wiha herî yekçarenûsî de jî nabin wekî me! Bi hezar rûyên xwe yên qirêj û zexel faşîst in ew! Maske rûpoş jî nikarin rûyê wan ê pîs bigrin an jî pak bikin."... ***R.4***

## Nexweşî herî zêde feqîran dikuje

Li seranserê cîhanê derdora 780 milyon kes bi nexweşiya Covîd-19 ketin û heta niha li cîhanê nêzî milyonek û 750 kesan jiyan xwe ji dest dane. Li gorî daneyên fermî li Tirkiyeyê bi rojane zêdetirî 20 hezar kes bi nexweşiya koronayê dikevin û heta niha bi giştî nêzî 2 milyon kes bi koronayê ketine û nêzî 20 hezar kes jî mirin. Li aliyê din li cîhanê kampanyayê aşiya koronayê hatin destpêkirin. Têkildarî nexweşiya Covîd-19'ê hevserokê Şaxa SES'ê ya Amedê Şiyar Guldîken ji rojnameya me re axivî û got ku hikûmet ji bo dewlemendan dixebite, gelek esnaf deyndar in lê deynên holdîngên mezin tên jêbirin. Guldîken diyar kir ku li cîhanê ji bo aşiyê xebat hatine destpêkirin hinek welatên dewlemend ji 10 qat zêdetir nifûsa xwe aşî peyda kirine û gelek welatên feqîr jî hêj aşî peyda nekirine... ***R.3***



*Bi dîlgirtina siyasetmedarekî din bersiv dan DMME'yê*

*Roja ku Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) biryar da ku divê hevserokê HDP'ê yê berê Selahattîn Demîrtaş ku niha di girtîgehê de ye were berdan, hevseroka KCD'ê Leyla Guven hat girtin. Dewleta tirk bi dîlgirtina siyasetmedareke kurd bersiv da DMME'yê. Leyla Guven li Roboskê hêsirên çavê dayikek ku xwişka du qurbaniyên Roboskê ye paqij dikir û di wê kêliyê de fotograf ji aliyê rojnameger Omer Îke ve hatiye girtin...* ***R.9***

## 'Ez ji wan natirsim'

Dayik Halîse Aksoy ku cenazeyê kurê wê bi kargoyê jê re hatibû şandin, polîsan avêt ser mala wê û ew binçav kirin. Polîsan di dema binçavkirinê de tahde li Aksoy û 4 mêvanê wê kirin. Aksoy got ku ew ji wan natirse, serî natewîne û wiha axivî: "Bi lingên xwe pêl newqa me kirin. Heqaret li me kirin. Gava avêtin ser malê, êrîş birin ser mêvanên me jî û serê mêvaneke me şikandin. Li me hemûyan dan. Gava polîsan mal sehî dikir, li ser xênî jî helîkopter diçûn û dihatin. Piştî 5 saetên li malê polîsan Aksoy û her çar mêvanên wê birin Midûriyeta Polîsan a Amedê. Piştî îfadeyê Aksoy û her 4 mêvanên wê hatin berdan... ***R.3***

## Karekter qeder e!

Zilamekî extiyar wiha digot: "Herakleîtos dibêje ku ethos antropos daimon!" û beriya ku wateya hevokê bibêje behsa bandora hevokê digot: "Heger ez jiyana xwe bikim du beş, ez ê wiha bibêjim beriya vê hevokê û piştî vê hevokê. Mirov piştî vê hevokê fam kir şûnda divê êdî weka berê nejî" û dûra wergera wê digot: "Karekterê mirov, qedera mirov e. Yanî dibêje karekter qeder e. Ji bo ethos mirov bibêje karekter bes e, ne bes e ne ewle me. Li şûna wê mirov dikare bibêje kesayet, xûy, xislet, elimandin. Em bi mînakan hinek behsa xwe bikin... ***Helîm Barîn / R.7***

# Girtî li zindanan bi rola pêşengiyê radibin



Îro dîsa li tevahiya zindanan, li hemberî zilmê, çirûska berxwedanê geş dibe. Îro bi pêşengiya jinan di serî de li zindana Amedê û her wiha li tevahiya zindanan, ji bo mirovahiyê têkoşînek tê dayîn. Tovê di dîrokê de bi destê jinan hatibû reşandin, vaye îro li her dera cîhanê geş dibe. Têkoşîna ji bo nasnameya jiyaneke azad bi nêrîna jinê, çi li derve, çi jî li nav çar dîwarên zindanan, bi xwe re hevsengiyên nû saz dike. Di vê qirna xapînok de, pêdivî bi hevsengiya têkoşîna jinan a gerdûnî ya hevgirtî heye. Têkoşerên li zindanan li gor ruhê demê tevdigerin... ***Adar Şaman / R.2***

LI HEMBERÎ TECRÎDÊ


## Greva birçîbûnê di meha duyemîn de ye... ***Nûçe / R.3***

## Xebatên Saziya Zimanê Kurdî

Hewldanên avakirina Saziya Zimanê Kurdî li rojavayê Kurdistanê ji 2003'an de hebûn, lê ji ber gefên rejîmê, karê xwe bi dizî dikirin. Piştî sala 2011'an bi piştgiriya Rêveberiya Xweser bi fermî dest bi kar û xebatên ziman û perwerdeyê kiribûn. Der barê vê mijarê de rêvebera saziya ziman Viyan Cûdî wiha dibêje: "Lêvegera me, em tevahî pirtûkên ku heta niha bi kurdî hatine amadekirin ji xwe re bingeh digirin, bi vê re jî çavkaniyeke me ya sereke civak e. Pirtûkên diyar tune ne, em li hemû berhemên ku di destê me de hene vedigerin." Hewla saziyê ew e ku... ***R.15***

## Serrîyêk ra seserre vetiş

Ma ameyê peynîya 2020î. Labele çi heyfo ke Tirkîye de ne pênîya zilm ne zî ê zilmkaran nêameyo. Tirkîye de zilmo pîl reyna eno serre de serê şarê kurdî ame. Awankerdişê komarî ra nata, kiştişê hezar kurdan bi Şeyh Saidî dest pêkerd û Dêrsim, Zîlan, Agirî, Cizîr û Nisêbînî dewom kerdo û enka zî dewam keno. Se kenê nêkenê nêeşkenê eno civak biqedênî, vindî bikerê û teslîm bigêrî... ***Av. Cemîle Turhalli / R .6***



## Paytexta mirovahîyê ya yekem

Ev şikeftên Hesûnê, dikare jê re were gotin ku paytexta beniademiyan a yekem e. Ev paytexta mirovahiyê ya yekem, niha ji sêsed malan, ango ji sêsed şikeftan pêk tê. Di wexta xwe de, li tu dereke din a dinyayê, bajarekî ew çend qerebalix tune bû. Bêguman di destpêkê de, ev şikeftên hanê... ***Agît Yazar / R.4***

## Rûsya li ser peyman û qewlê xwe nasekine

Der barê êrîşên li ser Eyn Îsayê û bêdengiya civaka navnetewî û dewletên rojavayî de me bi endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê û hevserokê Mekteba Ragihandin û Lêkolînan Qahreman Mûamed re axivîn. Qahreman Mûamed di axaftina xwe de da zanîn ku dewletên navnetewî ev 8 sal in ku li hember êrîşên li ser Rêveberiya Xweser tenê bi daxuyaniyan û bi gotinên sembolîk bertek nîşan didin û ji bo vê yekê jî Tirkiye êrîş dike. Mûamed wiha got: "Mixabin Rûsya her tim berjewendiyên xwe yên siyasî li pêşiya hevpeymanan digire. Yanî jê re qewl û ango hevpeyman ne muhîm e. Rûsya dixwaze berjewendiyên xwe bi pêş bixe di hundirê Suriyeyê de. Ev bêdengiya Rûsyayê ne tiştekî nû ye."... ***R.8***

# Zindan bi rola pêşengiyê radibin



Adar Şaman



Bi taybetî desthilatdariya AKP-MHP'ê bi gelemeperî dewleta tirk bixwe, ji bo xwe ji krîzan rizgar bikin, bi şeweyeke piralî êrîşî jin, civak û xwezayê dikin. Hewl didin nirxên hezaran salan ên bi taybetî bi keda jinan hatine afirandin, çi bi êrîşên fizîkî çi jî bi rê û rêbazên taybet ji holê rabikin. Bi hêsanî dikare bê gotin ku dixwazin 'cehaleta serdema Ebû Cehil' li ser civakê ferz bikin û wê birûxînin.

Bi vê zanebûnê dema mirov li zindanan binihêre, zindan neynika polîtîkayên desthilatdariyê ne û rûyê desthiladariyê yê qirêj bi awayekî zelal nîşan didin. Her ku lawaz dibe, "lepê" xwe li civakê dixe. Dema îro mirov ji derve li tarîtiya zindanan dinihêre, rûyê desthilata AKP û MHP'ê hîn baştir dibîne. Îro ji her serdemê bêhtir, sepanên dermirovî li ser fikir û bedena mirovan bi şêweyên cur bi cur tên ferzkirin.

Di hişmendiya pergala desthilatdar de, mirov mîna mirovan nayên hesibandin! Di pergala desthilata AKP-MHP'ê de her zindanek mîna aşê qirkirinê tê şixulandin. Ev jî qirkirina çand, fikir, ruh, bîr û baweriyê ye. Ev di heman demê de qirkirina jin û civaka demokretîk e.

Desthilatdarî, bi dîlgirtina jinên têkoşer, armac dike ku di pêşengiya fikir û nerîna jinê de civak neyê guhertin û xwe birêxistin neke. Aqilê netewedewletê, di kesayeta jinan de civakê parçe dike û wê ji cewhera wê qut dike.

**Pêdiviya civakê**

Hêza civakê, ji civakê hatiye dizîn. Civaka ku hêza wê nebe, ew civak ji her cure êrîşan re vekiriye. Pêdiviya civakê bi xwerêxistinkirinê heye. Loma jî tenê bi vî awayî dê dikaribe xwe biparêze. Rêxistinî jî bi zanebûnê pêkan e. Diyar e ku desthikata AKP û MHP'ê ji ber jina zana, rêxistinkirî û çalakvan bihêrs e û jê ditirse. Li gorî desthilatdariyê, cihê jinên têkoşer, afirîner, siyasetmedar û yên li hemberî bêdaletiyê serî radikin zindan e.

Mirovahî şahidê dîroka nêz a derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê ye. Bi qasî îro jin di zindanan de hene, dema rejîma 12'ê Îlonê evqas tune bûn. Hêrsa desthilatdariyê, ji jinên pêşeng û rexistinkirî, ji lawaziya aqilê pergalê ye. Li devereke ku aqil lê kêm be, li wir jiyan ditevizê û "ajo" serdest dibin. Ya jiyanê rengîn dike, hest in, manewiyat û aqil e. Bi dîlgirtina jinên têkoşer, ew tu carî nayên lawazkirin û teslîmgirtin. Ew ê her xwediyên gotinên xwe bin. Ew jinên bedew, têkoşer, şoreşger, bi aqil û hêza xwe pêşengiyê dikin.

**Keda azad civaka azad e**

Îro dîsa li tevahiya zindanan, li hemberî zilmê, çirûska berxwedanê geş dibe. Îro bi pêşengiya jinan di serî de li zindana Amedê û her wiha li tevahiya zindanan, ji bo mirovahiyê têkoşînek tê dayîn. Tovê di dîrokê de bi destê jinan hatibû reşandin, vaye îro li her dera cîhanê geş dibe. Têkoşîna ji bo nasnameya jiyaneke azad bi nêrîna jinê, çi li derve, çi jî li nav çar dîwarên zindanan, bi xwe re hevsengiyên nû saz dike. Di vê qirna xapînok de, pêdivî bi hevsengiya têkoşîna jinan a gerdûnî ya hevgirtî heye.

Deshilatdariya tirk bi salan e siyasetmedar, şoreşger, aktivîst û muxalîfan dixe zindanê. Armanca dewletê ji vê yekê ew e ku her kesî ji têkoşîna maf û adaletê dûr bixe û wan teslîm bigre, lê belê ev kesên ji bo dewletê "xeter in" û desthilatdariyê ew xistine nav çar dîwaran, di zindanên dewletê de jî têkoşîna azadiyê û heqîqetê didin. Ev kesên ji ber fikirên xwe yên siyasî rehîn hatine girtin, di nav çar dîwaran de jî serî natewînin û li hember zilmê berxwedanê bilind dikin. Cihê lê zilm û newekhevî hebe, li wir têkoşîn û serhildêrî heye. Her kêliya jiyanê bi kedê ava dibe. Keda azad civaka azad e.

**Dîlên azadiyê serî natewînin**

Zindan, ne tenê bi bedena xwe, bi gotin û fikrên xwe jî li hember neheqiyê û zextan radibin. Êrîş li ser beden, fikir, sekin û tevahiya jiyana dîlên azadiyê tê meşandin. Xitimandin û rizandina di siyasetê de, dibe sedem ku mirov bedena xwe bi birçîbûnê bihelînîn!

Zindan, di van kêliyên dîrokî de, bûne nûnerên kêliyên hêviyê, evîn û serkeftina siberojên bi hev re jiyana azad. Dîlên siyasî di bin xetereyek mezin de dest bi grava birçîbûne kirine.

Serî netewandina dîlên azadiyê, bi xwe re tirs û xofeke mezin dike dilê desthilatdariyê. Tenê tirsê nake dilê wê, desthilatdariyê gelekî agresîf û bihêrs dike. Em dizanin ku rêxistinbûn yekane çareseriya tevahî pirsgirêkan e. Ev yek jî bi têkoşînê pêk tê. Ji ber ku berxwedêrên zindanan, li hemberî bêadaletiyê, zext û êrîşan îro dîsa bedena xwe kirine mertal. Li şûna ku desthilatdarî daxwazên girtiyan bîne cih, beravajî vê yekê êrîşî wan dike û hemû alavên wan ên jiyanî desteser dike.

**Ruhê demê**

Mêtinger bi çavekî wisa li zindanan dinihêre ku ew li gor xwe dikare bi hêsanî desthilatdariya xwe lê serwer bike, berxwedanê bitepsîne, berxwedêran bêvîn bike û wan teslîm bigire. Lê têkoşerên zindanan, her carê ji nişka ve bi helwesta berxwedanê dadikevin qadên têkoşînê û pêşengiya derve dikin.

Têkoşerên li zindanan li gor ruhê demê tevdigerin. Pêşiya têkoşîna azadiyê ronî dikin û bi ruhekî kolektîf dibin hêviya çareseriya pirsgirêkan. Berxwedêrên zindanan tu carê serî netewandine û îro jî bi rola dînamîk a têkoşîna demokrasiyê radibin. Ruhê wan tu carê natemire û her diçe geştir dibe. Sekna zindanan, li dijî lawazbûn, dudilî û teslîmiyetê ye. Têkoşîna zindanan, dê jin û civakê azad bike.



## 'Jineolojî bû sedema guhertinên girîng'

Bi avakirina Komîteya Jineolojiyê û xebatên ku di vê qadê de tên kirin, li rojavayê Kurdistanê bû sedema guhertina hişmendiya civakê û perwerdekirina ciwanan.

Akademiya Jineolojiyê fikra jiyana azad û wekhev, bi 4 rêyan; Navendên Jineolojiyê, Dibistan, Enstîtuya Andrea Wolf, Fakulteya Jineolojiyê li nav civakê belav kir. Der barê kar û xebatên Komîteya Jineolojiyê yên salekê de endama Komîteya Jineolojiyê ya Herêma Firatê, Dîrok Qehreman nirxandin kir.

Qehreman diyar kir ku rista jineolojiyê ew e ku li hember zihniyeta desthilatdarî, tundî û êrîşên li dijî jinan û civakê tên meşandin, analîzkirina bi zanisteke rast bê bipêşxistin û çareseriyek bê dîtin. Qehreman da zanîn ku erka jineolojiyê ya sereke di astên civakî de bi gelemperî di guherîn û veguherîna wan de pêşengiyê bike û wiha got: "Bingeha civakê ciwan in. Bi taybetî da ku li hember zihniyeta zayendperestî û desthilatdariyê were sekinandin, jin û ciwan xwe hîn bêtir di asoyên pir kûr de nas bikin, li dibistanên amadeyî li seranserî bakur û rojhilatê Sûriyeyê waneyên jineolojiyê tên dayîn. Wekî gaveke gelekî baş li herêmên rizgarkirî wekî Minbic,Tebqa, Reqa û Dêra Zorê di vî alî de hat avêtin."

Di axaftina xwe de Qehreman destnîşan kir ku bi avakirina Fakulteya Jineolojiyê ya li Zanîngeha Rojava kûrbûna jineolojiyê jî di nav pergala perwerdeyê de cihê xwe girtiye û diyar kir ku li herêma Firatê cara yekem mêr li gorî zanista jin û jiyanê li akademiyan hatine perwerdekirin.

Qehreman axaftian xwe wiha bi dawî kir: "Hêvî û armancên me ew bûn ku em wekî Komîteya Jineolojiyê bikaribin bi rengekî zanistî jin xwe bi rê ve bibe, guhertinên heyî bi rengekî zanistî analîz bikin û jê re bibin hêza çareseriyê. Di salên pêşiya me de jî em ê xebatên xwe berfirehtir û kûrtir bikin." **QAMIŞLO**



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Piştî salekê

Bûye wek kevneşopî, her sal dawiya salê mirov kumê xwe datîne pêşiya xwe û muhasebeya sala derbasbûyî dike. Ez jî dixwazim bi vê munasebetê serpêhatiya xwe ya nivîsandinê ya salekê binirxînim. Ev salek e di rojnameya Xwebûnê de du hefteyan carekê bi awayekî rêk û pêk dinivîsim. Nivîsa min a yekemîn der barê Sakîne Cansiz de bû. Hem ji ber salvegera şehadeta her sê jinên li Parîsê hatin kuştin û hem jî ji bo nivîseke destpêkê bo min pîroz bû, min bi Saraya porsor dest bi nivîsên xwe kir. Ji wê demê heta niha hema bêje beriya her nivîsê salname jineke/jinên din pêşberî min dikir. Jinên ku yan bi tekoşîna xwe, yan bi şehadeta xwe, yan jî bi çalakiyên xwe mohra xwe li dîrokê xistibûn û dixin hemû pelên salnameyê dagirtibûn. Di ser de bûyerên rojane diqewimîn, serê xwe ji nav kaxiz û pênûsê derdixistin. Sal bi Sarayê dest pê kir, bi Leyla Guven ber bi dawî ve çû.

Wek kesekê ku kûrbûna xwe giranî li ser mijarên der barê jinan (bi taybetî jinên kurd) û femînîzmê de çêdike, min digot dê ne zehmet be, di mijara jinan de –bi rêk û pêk- nivîs nivîsandin, lê di pêvajoya nivîsandinê de min dît ku qet jî ne wisa ye. Nivîs bi serê xwe çiqas çalakî ye, yan jî çalakiyeke çawa ye, dikare bê nirxandin an jî pirsyarkirin. Her wiha ger mirov nivîsê wek amûra hest û ramanên xwe parvekirinê/mayîndekirinê bigire dest, tişteke xwezayî û ji rêzê ye jî, lê dema nivîs der barê jinan û têkoşîna wan de be, êdî ne tenê nivîs e, ne jî tenê parvekirina nêrînê ye, bi serê xwe têkoşînek e. Destpêkê jiyan û tekoşîna ku tê parvekirin xwendineke ne ji rêzê divê. Tu dikevî nav pelên dîrokê, yên hatine nivîsandin çeprast/serobino dikî (ya rastî sererast dikî), dikevî milê kirdeya xwe û jiyana wê pê re dişopînî. Di vê rêwitiyê de leqayî gelek tiştên nû dibî, wê ji nû ve nas dikî, şaşwaz dimînî, heyrana wê dibî, pê re aciz dibî, pê re kêfxweş dibî, car caran ji xwe şerm dikî; dibêjî çawa heta niha min vê agahiyê nizanibû.

Dîroka jinan pirî caran wek dîroka bindestbûnê tê pênasekirin, lê di pêvajoya nivîsandinê de dibînî ku ya rastî dîroka jinan dîroka berxwedaniyê ye. Jin her tim li ber xwe dane û didin. Peyv û gotinên hînkirî û hînbûyî ji nû ve dinirxînî. Bala xwe didî gotinê; baldartir nêzîk dibî. Car caran bi xwe re dikevî nakokiyê. Jina ku heta niha ji te re wek qurbanî xuya dikir, ji nişka ve dibe şêr li pêş çavên te.

Li hêla din dibînî ku jiyana jinan - rengê wan, çand û ola wan ji hev bi hezaran kîlometre dûr bin jî- digihîjin hevdu. Yên wan digihîne hevdu li aliyekî êşên wan be, li aliyê din jî berxwedana wan e. Li ser şopa mijara nivîsên xwe her tim bi şaşwazî leqayî hevbeşiyên jinên cîhanê bûm. Bo min nasandin û lihevgihandina têkoşîn/jiyana wan, ji hevdu sûd girtina wan girîng bû. Di vê çarçovê de nivîs di heman demê de bo min ji bo hevkariya jinên cîhanê peywir bû.

Ji bilî parvekirina jiyan û serpêhatiyên jinan bûyerên rojane dinqewimîn ji perspektîfa jinê şîrovekirin û vê yekê bi nivîskî ravekirin, te dike xwedî îdia. Divê tu vê îdiayê li her qadê biparêzî. Lewre "gotin difire, nivîs dimîne." Ji bo ku ya mayinde sibê li te çep venegere, bi teorîk û bîrdozî xwe dixemilînî. Ji ber vê yekê bo min pêvajoya nivîsandinê di heman demê de xwendekariyek bû.

Ji xeynî hemû van xalan bo min yekemîn sedema nivîsandina di Xwebûnê de, ziman bû. Min careke din dît, çawa ku jinbûn tenê bi zayendê nikare bê pênasekirin, çawa ku kurdbûn tenê bi etnîsîteyê, çawa ku welat tenê bi axê, malbat bi xwînê û koçberî bi dûrbûnê nikare bê pênasekirin, kurdî jî nikare tenê wek ziman bê pênasekirin. Wekî ku tê gotin, ziman mifteya cîhanê ye, min xwest bi vî awayî kurdî bo min di nivîsê de jî bibe warê jinê û mifteya cîhanê.

Salvegera Xwebûnê li we pîroz be. Sersala we pîroz be!

# Dayik Aksoy: Ez ji wan natirsim

Dayik Halîse Aksoy ku cenazeyê kurê wê bi kargoyê jê re hatibû şandin, polîsan avêt ser mala wê û ew binçav kirin. Polîsan di dema binçavkirinê tahde li dayik Aksoy û 4 mêvanên wê kirin. Aksoy got ku ji wan natirse û serî natewîne



Agît Îpek ê PKK'î di 2017'an de li Dêrsimê jiyana xwe ji dest dabû û cenazeyê wî di 2'yê adara 2020'an de bi kargoyê ji diya wî Halîse Aksoyê re şandibûn. Polîsan çend roj berê avêt ser mala Aksoyê. Di dema avêtina ser malê de deriyê mala Aksoyê hat şikandin û polîsan ew û mêvanên wê serdevkî dirêj kirin.

Dema polîsan mal sehî dikir, hin polîsan jî tahde li Aksoy û 4 mêvanên wê kir û serê mêvaneke Aksoyê hat şikandin. Piştî 5 saetên li malê polîsan Aksoy û her çar mêvanên wê birin Midûriyeta Polîsan a Amedê. Piştî îfadeya li midûriyeta polîsan Aksoy û her 4 mêvanên wê hatin berdan.Dayik Aksyo got: "Bi lingên xwe pêl newqa me kirin. Heqaret li me kirin."

**Deriyê malê şikandin**

Dayik Aksoy anî ziman ku polîsan bêyî ku li derî bixin, deriyê mala wan şikandine û ketine hundir û wê û mêvanên wê li ser betonê serdevkî dirêj kirine. Aksoy wiha got: "Bi lingên xwe pêl newqa me kirin. Heqaret li me kirin. Jixwe gava avêtin ser malê, êrîş birin ser mêvanên me jî û serê mêvaneke me şikandin. Li me hemûyan dan, bi pehînan."

**Heqaret û çêr kirin**

Dayik Aksoy got ku polîsan dest daniye ser telefonên li malê hemûyan û wiha got: "Gava polîsan mal sehî dikir, li ser xênî jî helîkopter diçûn û dihatin. Li malê tu tişt nedîtin. Çêr û heqaret li me kirin. Şopa li ser qedeh û amûrên li malê girtin. Polîsan ji min re got, 'ji ber ku me derî û paceyên we neşikandine divê tu giliyê me nekî.'"

Dayik Aksoy, anî ziman ku polîsan wêneyê kurê wê Agît Îpek ê li dîwar daliqandî nîşan dane û gotine: "Kurê te ev wêne ji te re şandin?" Aksoy got, "Min ji wan re got, we kurê min kuşt. Gotin, 'na, kurê te sax e.' Haya wan ji mirina kurê min tune ye."

Dayik Aksoy destnîşan kir ku di avêtina ser malê de tahde li wan hatiye kirin û piştî lêgerîna li malê qediyaye ew û mêvanên wê birine Midûriyeta Polîsan a Amedê û got polîsan jê re gotiye: "Mêvanên te ji bo plansaziya çalakiyê hatine? Tu endama HDP'ê yî? Tu çima diçî HDP'ê? Tu bi tena serê xwe dimînî, kî alîkariya te dike? Çima tu naçî cem zarokên xwe? Xaniyê te bi kirê ye yan ê te ye? Ji nav PKK'ê tu kê nas dikî?"

Dayik Aksoy got: "Ez ji wan natirsim. Çavê wan lê ye me bitepisînin. Ez ê serî netewînim." ***AMED***

# Nexweşî herî zêde feqîran dikuje

Navenda Nûçeyan

Li seranserê cîhanê derdora 780 milyon kes bi nexweşiya Covîd-19'ê ketin û heta niha li cîhanê nêzî milyonek û 750 kesan jiyan xwe ji dest dane. Li gorî daneyên fermî li Tirkiyeyê rojane zêdetirî 20 hezar kes bi nexweşiya koronayê dikevin û heta niha bi giştî nêzî 2 milyon kes bi koronayê ketine û nêzî 20 hezar kes jî mirin. Li aliyê din li cîhanê kampanyayên aşiya koronayê hatin destpêkirin.

Têkildarî nexweşiya Covîd-19'ê hevserokê Şaxa SES'ê a Amedê Şiyar Guldîken ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku heta niha li Tirkiyeyê tevdîrên pêwîst nehatine wergirtin û wiha got: "Bi hatina zivistanê hejmara weqayên şewbê gelek zêde bûn hikûmet dîsa tevdîrên beriya pêvajoya asayîbûna nû ya 1'ê hezîranê girtibûn xistin meriyetê. Ev tedbîrên nû yên hatin girtin dîsa pêşiya şewbê negirt, bandora wê sivik nekir. Çimkî tevdîrên nû yên hatin girtin ji bo hemû çînên civakê nebûn."

**Rewşa li malen xîzan**

Guldîken da zanîn ku rîska vê nexweşiya li hundirê malê zêde ye û wiha axivî: "Bi taybetî li malên xizanan kesên ku enfekte dibin ji ber hejmarên odeyên wan kêm in, daşir û banyo hevpar tên bikaranîn nikarin îzolasyonê pêk bînin. Ji ber vê yekê mal tev hev enfekte dibin û hejmarên nexweşên enfekte jî zêde dibin. Bi hatina zivistanê li gund û qezayan şênî li odeyeke sobeyê datînin û pê germ dibin. Ji ber ku derfeta wan nîn e li hemû odeyan sobê deynin şênî nikarin îzolasyonê pêk bînin û ji ber vê yekê mecbûr dimînin mesafeya civakî têk bibin."

Şiyar Guldîken got ku hikûmet ji bo bandora şewbê kêm bike plansaziyeke tekûz danayne ber xwe û wiha got:

"Kesên li fabrîqayan dixebitîn dîsa ji neçarî çûn karên xwe, karker, firinvan û kedkarên ku rojane bi 40-50 TL yewmiyeyê dixebitîn dîsa ew jî ji mecbûrî çûn karên xwe."

**Ji bo dewlemendan dixebitin**

Guldîken destnîşan kir ku hikûmet ji bo dewlemendan dixebite û wiha pê de çû: "Ev salek e şoforên otobês û texsiyan, dikandar, firinvan, qesab û gelek esnafên Tirkiyê di nav qeyraneke mezin de ne. Esnafên ku ji bo nikarin kireyên dikanên xwe bidin ji bankayan krediyê digirin û deynên wan bi faîzan li wan vedigerin. Li gel deynên bifaîz ên esnafan deynên holdingên mezin tên jêbirin û vesazkirin."

**Agahiyên rast parve nakin**

Guldîken anî ziman ku hikûmet têkildarî nexweşiyê agahiyên rast parve nake û wiha got: "Rêveberiyên nexweşxaneyan daneyan bi aşkera ji me re nabêjin. Ji sedî sed agahiyên rast nebe jî em ji kedkarên tenduristiyê daneyên pêketî mirinên ji ber şewbê berhev dikin. Hikûmet û wezareta tenduristiyê daneyan vedişêrin û bi veşartina daneyan di civakê de şikestina baweriyê çêdikin."

Guldîken got ku di vê serdema şewbê de berpirsiyariya herî zêde li ser milên kedkarên tenduristiyê bû lê li gel vê berpirsiyariyê gelek mafên wan ji aliyê hikûmetê ve hatin astengkirin. Guldîken bi bîr xist ku heta niha zêdetirî 130 kedkarên tenduristiyê jî jiyana xwe ji dest dan û li gel her tiştî kedkarên Tenduristiyê bi awayekî aktîf bi şewbê re têdikoşin.

**Dewletên feqîr û dewlemend**

Guldîken destnîşan kir ku li cîhanê ji bo aşiyê xebat hatine destpêkirin lê hinek welatên dewlemend ji 10 qat zêdetir nifûsa xwe aşî peyda kirine û gelek welatên feqîr jî hêj aşî nekirine û peyda nekirine. Guldîken got ku koronayê pergala kapîtalîzmê xistiye krîzê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Divê cîhan û civak bi piştevanîdayînê ji vê şewbê xelas bibin. Lewra ku ez biçim aşî û alavên hijyenê stok bikim û cîranên min ji bêderfetiyê nikaribin van alavan peyda bikin dê ewlehiya min jî tune be. Çimkî ez dê dîsa bi vê vîrûsê bikevim. Divê piştevanî dayîn bibe xala hevpar a herî girîng. Encax wê çaxê dê xelasî xuya be. Li cîhanê li cihekî tenê ev vîrûs bimîne jî dê ev metirsiya vîrûsê li ser hemû cihanê bidome."




## Greva birçîbûnê di meha duyemîn de ye

Greva birçîbûnê ya dorveger û bêdem ku ji bo rabûna tecrîda li ser Rêberê Gelê PKK'ê Abdullah Ocalan were bidawîkirin hatibû destpêkirin di meha duyemîn de bi koma 6'an didome. Grev di 27'ê mijdarê de bi dehan girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê hatibû destpêkirin. Girtiyan bang li hemû kesan kir ku piştgiriyê bidin çalakiya wan. Li wargeha penareban a şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) jî bi heman armancê grev hat destpêkirin û grev didome. ***AMED***

## Ji bo rojnamegeran ceza hat xwestin

Li Kurdistan û Tirkiyeyê zextên li ser rojnamegeran didomin. Danişîna 4'emîn a doza rojnamevan û nivîskarê rojnameya Xwebûnê Mehmet Şahîn ê bi îdiaya "rêxistin ava kiriye û bi rê ve biriye" tê darizandin li Dadgeha Cezayê Giran a 6'emîn a Amedê hat pêk hat. Dozger ji bo Şahîn 15 sal ceza xwest û doz taloqî 19'ê çileya 2021'an bû. Her wiha 27 sal û 6 meh cezayê girtîgehê derînendeyê berê yê rojnameya Cûmhûriyetê Can Dundar hat birîn û der barê wî de bultena sor hat derxistin. ***AMED***

## Rêyên gelek gundan hatin girtin

Demsala zivistanê li Kurdistanê bandora xwe nîşan da û ji niha ve rêyên gelek gundan hatin girtin. Zivistan herî zêde jî li herêma Serhedê, Dêrsim, Çewlik, Colemêrg û Şirnexê dijwar derbas dibe. Ji ber barîna berfê ku bi rojan e dibare li Colemêrgê rêyên 57 gundan li çûn û hatinê hatin girtin. Li deverên bilind ên bajêr berf 30 santîmetreyî derbas bûye. Hat ragihandin ku ji bo vekirina rê xebat hatin destpêkirin. ***COLEMÊRG***

## Rojnameger Elî hat binçavkirin

Rêveberê Medyaya Nalya Awat Elî piştî ku ji welatê Siwêdê vegeriya başûrê Kurdistanê, li balafirxaneya navneteweyî ya Hewlêrê ji aliyê polîsan ve hat binçavkirin. Rêveberê Sentera Metro Rehman Xerîb li ser mijarê ji Rojnews re axivî û got; "Sedema binçavkirina Awat, li ser giliyên berê yên lê hatibûn kirin e. Hemû giliyên berê jî peywendiya xwe bi televizyona NRT'ê ve hene. Me bi ofîsa serokê hikûmetê re peywendî daniye, pirsgirêk ber bi çareseriyê ye, dibe ku heya çend saetek din Awat Elî were berdan." ***HEWLÊR***

# Paytexta mirovahiyê ya yekem; şikeftên Hesûnê



Keştiya Alalû
Agît Yazar



Kevana Zêrîn, an jî Sêkuçikiya Zêrîn laboratuwara mirovahiyê ye. Em çiqas bi dewlemendiya dîroka xwe, xwe qure bikin, dîsa jî hindik e! Keştiya Alalû, vê carê xwe li ser Şikeftên Hesûnê datîne. Di vê xeleka derketina rêwîtiya dîrokê de, hûn xwînerên ezîz, herî kêm hûn ê derkevin rêwîtiya 14 hezar sal beriya niha. Hûn ê li pêşiyên xwe yên di şarge û şikeftan de dijîn, biqesidin. Kerem bikin, deriyê şikeftan li ser piştê ji we re vekirî ye. Heta meriv dikare bibêje, derî li ber tune ye. Loma jî kerem bikin, şerm nekin; xwe venegrin; mal, mala we ye!

Xwînerên ezîz, ev şikeftên Hesûnê, dikare jê re were gotin ku paytexta benîademiyan a yekemîn e. Ev paytexta benîademîyan a yekem, niha ji sêsed malan, ango ji sêsed şikeftan pêk tê. Di wexta xwe de, li tu dereke din a dinyayê, bajarekî ew çend qerebalix tune bû. Benîademî ji vî bajarê super mezin li hev kom bûn û nola şilê ya mêşa hingiv li hev zêde bûn û çûn ji xwe re li deverên nêzîk, li devê çeman, gund ava kirin.

Bêguman destpêkê, ev şikeftên hanê, ev çend ne wanî xweş bûn. Di nav demajoya dem û dewranên dirêj de, gihaştine vê merhela xwe ya niha. Wer tê fêmkirin, ewil çend heb şikeftên xwezayî hebûne. Pêşiyên me, ewil ew şikeftên xwezayî ji xwe re wekî mesken bijartine. Pêde pêde ji xwe re wan şikeftên xwezayî kolandine û jûr ji xwe re bi ser ve zêde kirine.

Gava meriv li şikeftên Hesûnê dinêre, ji bo bicihbûnê gelek guncaw bûye. Lewra pişta wan li hêla bakur e. Bi gelemperî, berê wan li hêla başûr e. Ev yeka hanê dihêle nav şikeftan, pirtir ji germahiya rojê, sûdê werbigirin. Her wiha li jêra şikeftan, deşta Farqînê li ber wan raxistiye. Ev jî tê wateya zêde zêde nêçîr û nêçîrandinê.

**Cotkarî, sewalvanî û bajarvanî**

Pispor dibêjin, jiyana li van şikeftan, merheleyek berî jiyana niştecihbûna avakirina gundan, dermalekirina ajalan, cotkarî û çandiniya dexil bûye. Dîsa tê gotin ku ewil benîademiyan genim, ceh, nîsk û nokên bejî berhevkirine. Yên ji ber xwarina wan a rojane mane, stoq kirine. Bala xwe danê, zivistanan ew genim û ceh, xerab nebûne. Ev yeka hanê, di jiyana mirovahiyê de nûvedana herî girîng bûye.

Gava benîademî wan genim, ceh, nîsk û nokên bejî berhev dikin, simil û şolikên wan jê diquraftin, ka û kelemên ji ber mayî jî davêjin ber devê şikeftên xwe. Rojek ji rojên xwedê, geşedanek xwezayî diqewime. Hingê, nexasim jî zivistanan, ajalên henûn ên wekî mih, bizin, çêlek û beraz tên wan ka û kelemên hanê yên li ser sergo dixwin. Bi vî awayî, ew ajalên hanê, bere bere dihewisin mirovan jî. Oxxxx! Çiqas tiştekî xweş! Lewra nêçîra wan êdî bi xweber tê li ber lingên wan. Nola negotî, koro ji xwedê xwest çavek, xwedê da cotek çav!

Bi kifşkirina genim ê bejî û hewisandina ajalên nêçîrê re, mirovahî ji serdemeke dijwar derbasî serdemeke zêrîn a bi xêr û ber dibin. Di vê hênê de, du tiştên din jî deqewimin. Benîademî, aqilê xwe dixebitînin, edî rojek tê, ew bi xwe zikê axa bi goşt diqelêşin û tovên dexlên xwe di axa cotkirî de diçînin. Hingê ew erda bi milyonan sal beyar mayî û têr bi vîtamîn, xêr û bera xwe di ser benîademiyan de dirijîne. Libek tov hêşîn tê, simil û şolik lêdikeve. Yek dibe pêncî. Li gor wê yekê, ka û kelem jî zêde dibe. Ev jî tê wateya zêde dermalekirina ajalan. Zêde ajal-dermalekirin jî tê wateya qatix, hirî, post û goşt.

Merheleya sêyemîn jî ew bûye ku bi çandina ceh, genim, nîsk û nokan re, pêdiviyek li ber çandiniyê natoriyê bikin derdikeve holê. Ji bo dexlêm xwe ji ajalên çolê biefidîne, ewil holikên sûkî ji xwe re çêkirine û heta dexilhilanînê, di wan holikan de, nobedarî kirine. Her çûye, holikên xwe qewîtir kirine. Bi vî awayî, rojekê ew wan holikên xwe qewîtir dikin û bi temamî ji şarge û şikeftan derdikevin, li wan avahiyên xwe yên nû bi cih dibin

**Pêşketina ziman**

Di jiyana mirovahiyê de, bi pêşketina van hersê tiştên jiyanî û herî girîng, wekî cotkarî, sewalvanî û bajarvaniyê re, rewşa benîademiyan a xweşguzariyê bilind dibe. Êdî benîademî birçî namînin, vîtamîna xwe bi dilê xwe distînin û şîr dikeve pêsîrên jinên bi dergûş, wan pêsîrên bi xêr û ber.

Her ku zarok bi çilekî, pêsîrên dayikên xwe, wan ên ji şîrê zerpitî dimêjin, kêfa şîrê sipî yê dayikê, li ser lêvên wan dikeve. Serê pêsîrên dayikan, nola kaniyên biharê der dibin. Dayik, guhê xwe didin ser mijandina zarokên xwe. Dengê ji mijandina zarok dihat, dengê miçemiça mijandina şîrê ji pêsîra dê bû. Mêtina wî şîrê dê, bû JIN, bû JIYÎN, bû JIYAN û dawerivî kûrahiya reh û rincên zarok. Navê xwe yê din yê MIJANDIN'ê, MÊTIN bû. Ew MÊTIN jî bû MÊ, bû MAK, bû MADIR. Ango MÊTIN, bû "mother" a îngilîziya niha. Bi vî awayî temenê benîademiyan dirêj bû, hiş û aqilê wan dewlemend bû û peyv li peyvê zêde kir. Ji yek peyvê, hezaran peyv zêde bûn. Genim bû NAN, bû DAN, bû DANE, bû DIRAN...

Ka, bû KELEM, bû QELEM...

Tîr, bû DAR, bû BER, bû, PERR, bû PIRR...

Bi vî awayî ziman bi pêş ket û binyata zimanê hind-ewropî hat danîn. Gelek etîmolog hemfikir in ku zimanê destpêkê yê, malbata hind-ewropa, ji hêla wî miletê ku cara ewil, genim dît, paşê ew genim çand, paşê cara ewil ajal kedî û dermale kir û piştre jî bajarê ewil ava kir, ew kîjan milet be, aha koka zimanê malbata hind-ewropî, zimanê wî miletî ye.

**Çend bajarên dîrokî**

Qotê Berçem, li jêra Erxeniya navçeya Amedê ye. Ev ajarê dîrokî yê dêwasa, 8 hezar û 200 sal B.Z hatiye avakirin.

Girê Çemka (Boncuklutepe) li ber navçeya Kerboranê ya bi ser Mêrdînê ve ye. Ev niştecih û perestgeha dîrokî, 9 hezar û 500 sal B.Z hatiye avakirin.

Girê Miraza, Qerehanyepe, Newala Çolê û Xirbetilsuxan, herî kêm 9 hezar û 500 sal B.Z hatine avakirin.

Çemê Xalan, li ber çemê Sasonê ye. Niha di bin bendava Ilisuyê de maye. Ev bajarê hanê jî, 9 hezar û 700 sal B.Z hatiye avakirin.

Heskîf, şopên mirovahîyê yên B.Z deh hezar sal berê lê hatine dîtin.

Girê Kortik, 14 km dikeve başûrrojavayê Batmanê. Ev bajar jî B.Z deh hezar û 500 berê hatiye avakirin.


Her wiha bi dehan tumulus û cihên dîrokî, di bin ava bendava Ataturk, Keban, Qereqeya û herî dawî jî bendava Ilisûyê de fetisandin.

De vêca şopên li şikeftên Hesûnê hatine dîtin, yên B.Z 11-12 hezar sal berê ne.

Xwînerên ezîz. De vêca hesab li ba we ye!

Nîşe: Ev agahiyên hatine dayîn, tevdek xwe dispêrin çavkaniyên kesên di qada xwe de pispor û tevdek bi palpişt in.

Yek ji van çavkaniyan, nivîskarê pirtûka Tufek/Tiving Mîqrob û Pola, antrepolog û dîroknasê navdar Jared Mason Diamond e.



Mizgîn Ronak

## Rûpoşxane

Ez û barana sibehê bi hev re meşiyan, kulîlkên berbaran li me mêze kirin. Qedîfeyên rengîn in ew; sor, zer, belek û kengê û li ku bin ên dapîra min a mûşî ne, berikên xwe yên şîrîn dihejînin ji bîranînên min ên dûr û zarok. Ez û barana dawiya salê bi hev re meşiyan, hûrik hûrik, bêdeng û bi hevalî. Hat bîra min ku di serê vê salê de jî ez û baranê bi tenê bûn. Me bi hev re dest bi salê kiribû û ew destpêk bi vê sernivîsê bûbû nivîsek li rojnameya me; "Otopsiya sedsalekê." Gelo ew kehanet bû çi bû? Lew sala 2020'an ji laboratuar, nexweşxane û dermanxaneyan derneket! Salek nexweş; bi korona bi maske, lepik, metirsî û şikdarî bû, baskên xwe gihandiye sala hatî jî. Ji niha ve ew sal (2020) jî bi rûpoş, lepik û derman û laboratuwaran (laboratuar; ji van zimanan tê, ne ji tirkî! Spanyolî, îtalî; laboratorîn, îngîlzî laboratory û binyata wê jî ji peyva "labar" a bi van zimanên navborî yên latînî tê xwedî wateya "kar, xebat, karê giran."

Yanî her kes li her derê dîsa hinek hepsî ye lê em ji bîr nekin ku berê jî em ji rûpoş, lepik, laboratuar û karantînayan azad nebûn. Belam ew "berê" niha ji me re çiqas ronî, dilşad û bextewar tê! Hişmendiya mirov wiha ye, tişta bi qusûr û kulek, piştî ji dest diçe, "bêqusûr" û dilkêş dibe! Belkî em bêjin çawa nebe! Rewş xirabtir bûye. Rast e rewş xirabtir bûye lê em jî ji berê zanatir, paktir û jîrtir bûne. (Herhal tê fêmkirin ku min latînî di wateya zimanên dayika wan (Romanî) ye de bi kar aniye) Em êdî tiştên bi çavên xwe yên (waye em baş pê hesiyan) bi rastî jî nîvkorî ne, nayên dîtin jî, DIBÎNIN!

Dîtina me ji çavan derbas bû. Êdî bi zanînê jî dibînin em, bi texmînê, bi fikirînê. Rûpoşên li rûyê me, rûyek zana nîşanê me dide. Rûyek ku ne tu kes e û her kes e. Ger bê bîra me, wextekê yên birûpoş Zapatîstên meksîkî yên çeleng bûn û ji xwe re digotin "Em ên rûyê wan nîn in." Bi vî awayî hiyerarşiyê tarûmar dikirin! Şervan û fermandar, pispor û nezan ji holê radikirin. Wan tenê rûyek hebû, ew jî "bêrû" bû! Tu tiştek li ser nedihat nivîsandin. Tu tişt jê nedihat xwendin. Îja niha her kes wekî Zapatîstan "bêrû" ye, yekrû ye, ne durû û sêrû ye. Em hemû wekî kirdeyên vî fîlîmê birûpoş li paş camekanên "bêrû" li xwe, li hev li jiyan û pêşerojê mêze dikin.

Way me salekê wiha qedand jî. Bêguman di nav vî fîlîmê ku her kesê kiriye xwediyê yekrû de jî faşîzan nesekinî û îspat kir ku ew tu carî, di nav rewşên wiha herî yekçarenûsî de jî nabin wekî me! Bi hezar rûyên xwe yên qirêj û zexel faşîst in ew! Maske rûpoş jî nikarin rûyê wan ê pîs bigirin an jî pak bikin. Ew ê her û her durû û rûkirêt bin û di vî fîlîmê awarte de jî diz, kujer û talanker bin. Bila bibin, ev ceza besî wan e lê em rûveşartiyên li paş maskeyên spî hew maye xewnereşkan bibînin, ji bîr nekin ku jiyan û zeman li gorî watedayîna me ye. Em dikarin ji van demên koronayê jî keşfên nû, çîrokên nû, gihîştinên nû, hembêzkirinên nû derxînin.

Sala nû li derî dide. Ez û baran dimeşin bi hev re kulîlkên şilbûyî qala havînên geş dikin. Ez, baran û kulîlkê ji we pir hez dikin û vê helbesta xwe ya teze bo sala nû diyarî we dikin!

**Xewn;**

*"Xewndîtina te bû/dema ku kulîlkên naylon li eywanek zarokatiyê diçilmisîn/çavên te yên vekirî bûn xewn/gemî derbas dibûn ji mijangên te/tu qet nedihatî/xewn bûm ez/li çavên vekirî/te qet nedidît/perperok derbas dibûn/di sibehek şox û şeng de/min bibîne/bibim xewn ji te re/bila berbangek kevn hilbê/li çavên te yên girtî/fistanê min bi gulbeyanan re bifire/min bibîne bi çavên vekirî/bila xewn bi xewn/perên xwe biweşînin çûk/di êvarsorkê de/dîtina te xewn bû/di şevên bêheyv de/stêrk diçirisîn di çavên min de/te qet nedidît/ewr derbas dibûn ji mijangên te."*

(Rûpoşan me ji kenên sexte, zexel û makyajwarî jî xilas kirine ne?) Gelo Make-up/meykap) a îngilîzî, di ser tirkî re çawa ketiye zimanê me bûye makyaj.

# 2021 pîroz be

## Bila sala 2021'an bibe sala pêngavên nû û serkeftinê

Em sala 2020'an li pey xwe dihêlin. Li aliyekî zext û êrişên mezin, şer, tecrîd, pevçûn, neheqî, xizanî, pandemî û serkutkirin, li aliyê din jî têkoşîneke bêhempa, helwesteke bixwebawer û berxwedaneke domdar... Di sala 2021'an de jî zihniyeta zordest û dîktator, li ber siberoja ronak a gelên me xetereyeke mezin e. **Li hemberî vê zihniyetê, di sala 2021'an de jî, li ser esasên demokratîk û wekhev; berpirsyariya me ya bilindkirina têkoşînê, qayîmkirina yekîtî û yekrêziyê zêdetir e.**

Êrişên li hemberî doza me ya wekhevî û azadiyê û armanca me ya demokrasî, aştiya birûmet û jiyaneke adil, me ji riya me venagerîne û têkoşîna me ya civakî xurttir dike. **Em ê di sala 2021'an de jî li dijî zordestên ku bêhna gelê me diçikîne, têkoşîna azadî, rûmet û hebûnê bilindtir bikin.**

Li hemberî zihniyeta AKP-MHP'ê ya ku hemû nirxên mirovî û mafên bingehîn binpê kiriye, em nûnerên azadî, wekhevî, aştî û têkoşîna demokratîk in. **Bi vê berpirsyariyê li hemberî gelên xwe û nirxên xwe, em ê di sala 2021'an de jî têkoşîna ji bo mafên gelê xwe û hemû bindestan bilindtir bikin.** Em ê sala 2021'an bikin sala hêvî, pêngavên nû û serkeftinê.

Em dikarin sala 2021'an bikin sala demokrasî, aştî, wekheviyê û têkoşîna edaletê mezin bikin. Bi hêviya ku ewrên reş û tarî yên li ser gelên me belav bike û riya jiyaneke ronak û birûmet veke, **sala 2021'an li hemû gelan; li jinan, li ciwanan, li kedkar û bindestan pîroz be.**

Pervîn Buldan – Mîthat Sancar
Hevserokên Giştî yên HDP'ê




HDP

# Sersala we pîroz be!

Sala 2020'an ji ber pandemiyê li hemû cîhanê bi zehmetiyan derbas bû. Me saleke din li pey xwe hişt. Sala 2020'an bi mirovan da fêmkirin ku divê mirov bi heskiriyên xwe re hevgirtî be. Bi hêviya em hemû zor û zehmetiyan bi hev re derbas bikin, her bi gelê xwe re bin û xizmeta gelê xwe bikin. Di serî de em ji bo welatê xwe, ji bo hemû cîhanê hêvî dikin ku sala 2021'ê bibe sala aştî, piştevanî û tenduristiyê.

Şaredariya Çinarê

# Cudahiya di navbera çîrçîrok û çîrokê de



Yasemin Elban

**Çîrçîrok yek ji şaxên girîng ên wêjeya gelêrî ye, afirandin û berhemên gel e. Dîroka wan ne diyar e, çîrçîrok ji bo perwerde û pêşketina zarokan roleke girîng dilîzin, ji bo mezinan jî wekî roman an jî fîlman dibin mijûlayî û sebir**

Beriya her tiştî divê em der barê pênaseya nav de xwe hinekî zelal bikin. Bi dîtina min çîrok pênaseyek ne rast e. Zêdetir ji bo qiset an jî serpêhatiyan tê bikaranîn. Li şûna peyva çîrokê, çîrçîrok bê gotin bêhtir di cih de ye. Lewre çîrçîrok hinekî di nav xwe de tê afirandin û derewan disêwirînin. Ji ber vê ez dixwazim li şûna çîrokê peyva çîrçîrokê bi kar bînim. Li hin deveran jî ji bilî çîrok û çîrçîrokê, meselok, xeberoşk, xemşok, qewil û çîrvanok jî tên bikaranîn.

**Dîroka wan kevnar e**


Çîrçîrok şaxeke girîng a wêjeya gelêrî ye ku ji afirandin û berhemên gel pêk tê. Dîroka wan ne diyar e. Bi devkî hezar û hezar salan heya roja me ya îro hatine. Di çîrokan de, serboriyên lehengên derasayî, awarte û ji dereqlî tên vegotin. Pêwîstiya wan bi cih û demê tune ye. Çîrçîrok babeteke ji wêjeya devkî ye. Hinek ji wan ji aliyê çîroknûsan ve hatine nivîsîn, lê gelek ji wan jî hatine jibîrkirin.

Çîrçîrok bi gotinên lihevanînok ve dest pê dikin û bi gotinên lihevanînok ve bi dawî dibin.

Bi piranî çîrçîrokên kurdî bi van gotinan dest pê dikin, 'hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibare, li ser hazir û guhdêran bi tevî der û cîranan, ji xeynê dêwên keleman; hebû tûne bû rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, bi tevê sêwî û bêmalan, ji xeynî dizên xiyaran; carek ji caran rehmet li dê û bavên hazir û guhdaran; bi tevî derî û cîranan, ji xeynî dêwên keleman; carekî cebarekî xwedê pêxember qerarekî, kûsî rabû ser serê darekê erd hejiya dar leqiya, kûsî ket her du çavên wî riijya; kûsî kete gelek gemiyan li dinyayê geriya, li behra reş vegeriya, mişk û mar li hev civiyan; hinekan go 'axiriya dewrê ye, hinekan jî go 'na ne axiriya dewrê ye gurmegurma mirqota qîza kurê kerê ye.' û hwd.

Dawiya çîrçîrokan jî bi van gotinan diqedin, 'çîroka me çû nav diyaran, rehmet li dê û bavên we guhdaran, bi tevî sêwî û bê malan, ji xeynî mişkên qulên dîwaran; çîroka me çû nav zeviyan rehmet li dê û bavên we hemûyan ji xeynî papaxgeniyan' û hwd. Bi piranî çîrok bi bextewarî diqedin.

Gava em li pênaseya babetên çîrçîrokan binêrin em ê têbigihêjin ku anatomiya çîrçîrokan tev nêzî hev in, bes kinc û libasên wan hinekî ji hev cuda ne. Her çiqas di nav çand û erdînîgariyên cuda de bin jî dirûvên wan nêzî hev in, lê dîsa jî her çîrçîrok bi serê xwe bawerî û vegotinekê di nav xwe de dihebîne. Wek mînak di çîrokan de, bi gelemperî hejmarên sereke tên bikaranîn, weke: çil cewal zêr, çil zêrên zer, çil hesp, çil siwar, çil berbû, çil kêroşk, çil derî, çil şev, çil roj; an heft kurê paşê, heft bira, heft xwişk, dêwekî heftserî; an jî sê bira, sê xwişk, sê heval, sê qewil, du destebira, du xwişk, du destexweh, du cûwal derew û hwd tên bikaranîn...



**Girîngiya çîrçîrokan**

Çîrçîrok, ji rastiya jiyanê dûr bên xuyan jî ji bo her kesî, bi taybetî jî ji bo zarokan dinyayeke rengîn û awarte diafirîne. Çîrçîrok, her çiqas zêhna mirovan şêwe nekin jî mafê hemû zarokan heye ku bikevin nav dinyaya derêrastî û rengîn. Pêw-îst e, hemû zarok siwarê xaliçeya bisihir bibin, behr, çiya, banî û robaran biborin, xwe bigihijînin serê çiyayê qaf, bi Mîrza Mihemed an jî bi keybanoyekê re di nav xasbaxçeyan de bigerin.

Çîrçîrok ji bo perwerde û pêşketina zarokan roleke girîng dilîzin. Ji bo mezinan jî wek roman an jî wek filîman dibin mijûlayî û sebir. Li gor zanyaran, zarok bi saya çîrçîrokan jiyanê bêhtir fêm dikin. Di jiyanê de haya wan li gel qenciyê ji xerabiyê jî çêdibe. Bi şer û têkoşîna qenc û xeraban, ew tim dibin alîgirê qencîxwazan. Di çîrokan de giştik karekterên qencîxwaz bi ser dikevin. Ev jî dibe sebeba fikreke zindî yên serkeftina xwedî erdem û mafdariyê. Zarok bi rêya çîrçîrokan cure û cure karekteran dinasin.

Çîrçîrok, dinyeya xeyalan reng û reng û dewlemend dike. Zarok bi vegotin û xwendina çîrçîrokan, peyvên nû hîn dibin, bi zimanekî rengîn bi rêk û pêk xwe îfade dikin. Hêza fikir, raman û hestên xwe bi çîrçîrokan ve dikemilînin. Hunera hizirkirina nedîtbar bi çîrokan ve geş dikin. Pêwîst e, hemû dê û bav ji zarokên xwe re çîrçîrokan vebêjin an jî bixwînin. Bi vegotin û xwendina çîrçîrokan ve di navbera dê, bav û zarokan de danûstandineke ji dil û can û germ çêdibe.

**Li cîhanê rewşa çîrçîrokan**

Li cîhanê, têgeha çîrçîrokan di wêjeya yewnanan de Ezop, Beydaba di wêjeya hindan de cihekî pir muhîm girtiye, "Hezar û yek şev" di wêjeya ereban de, li Fransayê çîrokên La Fontaine, li Almanyayê "Birayên Grimm" û di wêjeya Danimarkayê de jî çîrçîokên "Andersen" cih girtine.

Çîrçîrok di çanda kurdan de xwedî roleke mezin in. Gelê kurd bi çîrçîrokan ve jiyana xwe xemilandiye. Çîrçîrokên kurdî hin caran bi wezin û awaz, hin caran jî wekî axaftin tên vegotin. Li her gund û taxeke Kurdistanê çîrokbêjên navdar hebûne û ji aliyê wan ve hatine vegotin.

Ev yek bi hezar salan e di şevên zivistanên sar û dirêj de bûne navgîna kêf û mijûlahiyê. Her çiqas îro zarok dema xwe bi mobîl, kompîter û li ber televizyonan derbas dikin jî li hin cihên gundewar ev kevneşopî hê jî didome...

Kurdên mişextî yên li Ermenistanê, li Şamê, penaberên li Swêdê û di van salên dawî de kurdên li Bakur gelek çîrçîrokên gelêrî berhev kirine û nivîsîne.

## Taybetmendiyên çîrçîrokan

**1.** Di çîrçîrok de mijarên awarte û derêsayî hene.
**2.** Taybetmendiyên lehengan ne ji rêzê ne.
**3.** Cih û dem ne diyar in.
**4.** Ji her çîrçîrokekê mirov dersek an jî şîretek derdixîne.
**5.** Çîrçîrok bi gotinên lihevanînok dest pê dikin û gotinên lihevaninokê bi dawî dibin.
**6.** Di piraniya çîrçîrokan de jîndarên awarte, wek cin, perî, ferişte û dêw, cih digirin.
**7.** Lehengên çîrçîrokan, piştî têkoşîna zor û dijwar di dawiya çîrçîrokan de digêjîne armanca xwe û bi bextewarî diqede.
**8.** Wesfê çîrçîrokan çi dibe bila bibe bi her ewayî ve xeyalî ne.
**9.** Metnên wan zêdetir bi şêwazek hunerî û wêjeyî pêk tên.
**10.** Hilberên wêjeya devkî ne, lê hinek berhemên nivîskî jî hene.




Helîm Barîn

# Karekter qeder e!

Zilamekî yextiyar wiha digot: "Herakleîtos dibêje ku ethos antropos daimon!" û beriya ku wateya hevokê bibêje behsa bandora hevokê digot: "Heger ez jiyana xwe bikim du beş, ez ê wiha bibêjim beriya vê hevokê û piştî vê hevokê. Mirov piştî ku ev hevok fêm kir şûnde divê êdî wekî berê nejî" û dûre wergera wê digot: "Karektera mirov, qedera mirov e." Yanî dibêje karekter qeder e. Ji bo ethos mirov bibêje karekter bes e, ne bes e ne ewle me. Li şûna wê mirov dikare bibêje kesayet, xûy, xislet, elimandin. Ferq nake, ew ê ev bandorê li şîroveyên me neke. Vê gavê karekter baş e. Em bi mînakan hinekî behsa xwe bikin: Heger di karekterê neteweyekê de yekitî tune be; parçebûn qeder e. Mînakek din, heger di karektera mirovekê-î de welatparêzî tune be cehşîtî qeder e. Yeka erênî bibêjim; eger di karekterê tevgerekê de têkoşîn hebe serkeftin qeder e. Werhasilî kelam tu karektera xwe biguherînî, tu yê qedera xwe biguherînî. Bi vî awayî qedera mirov dikeve nav destên mirov. Mirov xwe ji dorpêça qederê xelas dike. Silavan li zadiyê dike. Helbet azadî her silavê venagerîne. Beriya ku silavê hilîne li berpirsyariyê dinêre. Tu azad bî êdî berpirsiyar tu yî. Serdema gazinan xelas. Ma mirov belaheq koletiyê hildibijêrin! Kole kesên bêkarakter û bêberpirsiyar in. Karekterek serberdayî helbet te ber bi qederek rezîl ve bibe, lê ew jî gelek caran ji bo xwe ji vê berpirsiyariyê pa bikin xwe diavêjin bextê gotina: cografya qeder e. Ez jî wisa bibêjim, cografya jî karekter e! Ortega Y Gasset jî di çerçoveyeke din de dibêje "hawîra mirov qedera mirov e". Helbet cografya jî welat jî malbat û hevalên derdora me jî bandoreke mezin li jiyana me û li dahatuya me dikin, lê hêza ku vê bandorê li gorî dilê xwe biguherîne û bike qeder karekter e. Her feqîr nabe parsek. Her kurd mixabin nabe şervanê azadiyê. Her nivîskar destdirêjiyê nake. Te gotibe karekter qeder e êdî tu nikarî bibêjî qeder bû, qewimî. Erê qewimî, erê qederê bû lê karektera te ber bi vê qederê ve tu birî. Felekê yeman na, karektera yeman e ya tu jê gazinan dikî. "Çima ev hatin serê min" gazineke pûç e êdî. "Çima min ev anî serê xwe" çêtir e, rasteqîntir e, lê mirov çawa ew ê karektera xwe û pê re qedera xwe biguherîne? Hema bi derbekê bibêjim ji xeynî filozofiyê tu rêbaz tune ye. Weke Zana dibêje: "Fîlozofî ew ê bibe xala sereke ya civaka azad."

**Sîseban**

Min dema li ser têkiliya karekter û qederê dinivîsî fîlma Lîsa Çalan a **Sîseban** li ser youtubê hat parvekirin (https://youtu.be/WhFal_F7wQY ). Bi teknîkek (VR) cuda hatiye kişandin. Mijar jî bi qasî hûn bibêjin sade bû lê ewqas jî tevlihev bû. Fîlm li ser 12 deqeyên Lîsa Çalan bû û bi min pirsek dikir ji me: "Ēş li ku ye?"... Lê bêtir di çerçoveya karekter û qederê de dixwazim behsa vê yekê bikim. Lîsa Çalan hem bi çêkirina fîlman hem bi axaftinên xwe yên di bernameyan de û hem jî bi sekna xwe ya li mehkemeyan nîşan da ku qedera wê karekterê wê ye. Ji teqînan heya tehdîdan tu tişt dê tu caran ew ê ji karekterê wê yê berxwedêr û azad tiştekî kêm neke... Destxweş Lîsa Çalan.



# Rûsya li ser peyman û qewlê xwe nasekine

Navenda Nûçeyan

**Endamê Meclisa Giştî ya PYD û Hevsrokê Mekteba Ragihandin û Lêkolînan Qahreman Mûamed der barê êrîşên li ser Eyn Îsayê de axivî. Mûamed diyar kir ku ji ber dewletên navneteweyî bêdeng in êrîşên Tirkiyeyê zêdetir dibin**

Tê zanîn ku 9'ê cotmeha 2019'an, Tirkiyeyê êrîşî bajarên Bakur û Rojavayê Sûriyeyê Serêkaniyê û Girê Spî kiribû û ew dagir kiribûn. 17'ê cotmeha 2019'an jî bi DYA'yê re peymana Enqereyê û 22'yê cotmeha 2019'an jî bi Rûsyayê re peymana Soçiyê îmze kiribû. Serê hefteyekê ye jî êrîşê Eyn Îsayê dike û tevî ku Rûsya garantorê agirbesta li Soçiyê ye jî bi tu awayî peywira xwe ya garantoriyê bi cih nayne.



Der barê êrîşên li ser Eyn Îsayê û bêdengiya civaka navneteweyî û dewletên rojavayî de, me bi Endamê Meclisa Giştî ya PYD û Mekteba Ragihandin û Lêkolînan Qahreman Mûamed re axivîn. Qahreman Mûamed di axaftina xwe de da zanîn ku dewletên navneteweyî 8 sal in li hember êrîşên li ser Rêveberiya Xweser tenê bi daxuyanî û gotinên sembolîk bertek nîşan didin û ji bo vê yekê jî Tirkiye êrîş dike.

Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Qahreman Mûhamed der barê Eyn Îsayê de diyar kir ku êrîşên Tirkiyeyê ne ji 9'ê cotmeha 2019'an ve ji destpêka krîza Sûriyeyê ve û heta roja me ya îro jî berdewam dikin û wiha got: "Bi van êrîşan dewleta tirk dixwaze barê Rêveberiya Xweser ji aliyê siyasî, leşkerî û aborî ve giran bike û ji aliyê navnetewî ve jî rewşê xirab û zahmetir bike. Yanî armanca dewleta tirk tim dagirkerî ye. Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, dixwazê tevî dagir bike. Vê yekê jî bi rêya çete û opozisyona bi destê xwe çêkirî, dike. Armanca Tirkiyeyê di destpêka krîza Sûriyeyê de ew bû ku rejîma Baasê bişikîne, lê piştre wek tê zanîn armanca wê guherî û niha jî hewl dide hêza Rêveberiya Xweser ji holê rabike û bandora wê bişikîne, kontrol bike. Ji ber vê jî bênavber êrîş dike û dixwaze kontrolê bi dest bixe. Mînakên vê jî ji dagirkirina Efrînê heta Serêkaniyê û Girê Spî, Cerablus, Ezazê ne. Li gor armanca Mîsakî Mîllî tevdigere. Sedema duyem jî ew e ku beriya Joe Biden dest bi kar bike dixwaze hin deverên din jî bi dest bixe ku hin mafan bixwe re bibîne. Nêzîkaiyên dewletên wekî DYA'yê jî wisa ne. Te çiqas erd bi dest xistibe, te çiqas dagir kiribe ewqasî dikarî bibî xwedî maf. Ji ber van sedeman her diçe Tirkiye êrîşên xwe zêde dike û êrîşa li ser Eyn Îsayê berdewam dike."

**Girîngiya Eyn Îsayê**

Qahreman Mûamed destnîşan kir ku bi taybetî li ser Eyn Îsayê êrîş pêk tên û ev tişt anî ziman: "Şer niha li bakur û rojhilatê Eyn Îsayê, gundên Mişêrfê û Cehbel heye. Girîngiya Eyn Îsayê ew e ku gelek rê tê de diçin. Bi erebî jê re dibêjin 'eqdit mûessallat' bi kurdî jî ev rê wek rêya girêk tê pênasekirin. Cihekî stratejîk e. Ji rêya Kobanê heta Tebqa, Reqayê tê re derbas dibin. Dewleta tirk dixwaze bi dagirkirina Eyn Îsayê van rêyan ji hevdu qut bike. Dixwaze otobanê bixe bin serweriya xwe. Jixwe di destpêkê de Eyn Îsa paytexta Rêveberiya Xweser bû, wek sembolek bû ji bo rêveberiyê. Tirkiye dixwaze Eyn Îsayê ji bo van sedeman bi dest bixw, lê ez vê jî bêjim ku niha di milên leşkerî de gavek jî pêş de nehatiye û HSD li ber xwe dide."

**'Rola garantoriyê bi cih nayê'**

Mûamed di derheqê garantoriya Rûsyayê de da zanîn ku tifaqa di navbera Rûsya-Tirkiyeyê de, Rûsya beşeke sereke û esasî ye û axaftina xwe wiha domand: "Mixabin Rûsya her tim berjewendiyên xwe yên siyasî li pêşiya hevpeymanan digire. Yanî jê re qewl û ango hevpeyman ne muhîm e. Rûsya dixwaze berjewendiyên xwe bi pêş bixe di hundirê Suriyeyê de. Çawa berê Tirkiyeyê da Efrînê, berê çeteyên opozisyonê ji Hota, Şam û başûrê Sûriyeyê da Idlibê, niha jî berê wê dide Eyn Îsayê. Yanî Rûsya her tim herêmekê li beramberî herêmeke din dide. Ji ber wê jî ev bêdengiya Rûsyayê ne tiştekî nû ye. Ya din jî bi vê êrîşa Tirkiyeyê dixwaze zextan li HSD'ê bike ku Eyn Îsayê radestî rejîmê bike. Rûsya bi vê bêdengiyê dibêje 'yan ez an jî êrîşên dewleta Tirkiyeyê'. Em vê nêzîkatiya Rûsyayê teqez qebûl nakin û divê vegera ser garantoriya xwe û dev ji rola xwe ya neyînî berde. Rûsya jî dixwaze beriya DYA'yê serweriya xwe sexlemtir dike."

**'Banga dewletên rojavayî lawaz e'**

Qahreman Mûamed da destnîşan kir ku civaka navneteweyî û dewletên rojavayî 8 sal in li hember êrîşên li ser Rêveberiya Xweser bêdeng in û ev tişt anî ziman: "Tê zanîn ku gotinên civaka navneteweyî û dewletên rojavayî lawaz in û bi dengekî kêm dibêjin hewce ye êrîş nebe hwd. Îro em li bang û nêrînên dewletên rojavayî dinêrin, tim di naverokeke siyasî de ye. Bi daxuyaniyan an jî bi gotinên sembolîk diaxivin. Me ev nêzîkatiyên wan ên ji axaftinan wêdetir naçe û axaftinên vala di dagirkirina Efrînê de jî dît. Dema Tirkiye jî dibîne dewletên rojavayî dengê xwe dernaxin ew jî êrîş dike, Rûsya êrîş dike. Ev dagirkerî ji bêdengiyê ye, ji helwesta tenê di axaftinê de dimîne. Gere îro rola van dewletên rojavayî û civaka navneteweyî ji axaftinê zêdetir be. Ji ber ku îro HSD parastina cîhanê tevî dike, parastina nirxên gelan dike. Tenê helwesta bi axaftinê têrî van êrîşên dijmirovî nake. Hewce ye îro ev dewlet li hev bicivin û dawî li van êrîşên Tirkiyeyê bînin. Yanî em dizanin ku ew jî ji bo berjewendiyên xwe bêdeng dimînin lê gere li hember van berjewendiyên ku li ser komkujiyan pêk tên, bisekinin. Bi salan e êrîş li ser rêveberiyeke wisa hene ku li hember hemû komkujiyan desekine û mafên mirovan diparêze. Gelo rola dewletên rojavayî li hember van neheqiyan çi ye?"

**Ji bo çareseriya Sûriyeyê**

Di dawiya axaftina xwe de Mûamed bang li dewletên navneteweyî kir ku dengê xwe li dijî êrîşên Tirkiyeyê bilind bikin, hewce ye bi roleke erênî tevbigerin û wiha got: "Dê gelê Sûriyeyê heta kengî di nav xwînê de bin. Êdî bila tenê ji bo berjewendiyên xwe tevnegerin û berjewendiyên wan ne li ser xwîna me bin. Bila herî zêde ji bo çareseriyê tevbigerin."





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Peymana înkara îradeya gelan

Çend roj berê serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî li qesra Erdogan bû. Dîmenên maseya ziyafeta wan bûbû sedema hin nîqaşan jî. Melûm e li Tirkiyeyê krîzeke aborî heye lê qodemanên li qesrê her tişta ku dixwazin dikin.

Em vegerin meseleyê. Di wê civînê de xuya ye Erdogan mijara Mexmûrê jî daniye ser maseyê û bi alîgirên xwe re jî bo jihevxistina Mexmûrê kar daye kirin. Li gor wî, şêniyên mexmûrî hemû PKK'î ne û divê ew kamp demildest were belavkirin ango were tunekirin.

Waliyê Duhokê Elî Teter ku di heyeta Kazimî de bû, naveroka wê hevdîtinê aşkera kir. 17'ê kanûnê, serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî serdana Tirkiyeyê kir. Kazimî bi Erdogan re hevdîtin kir. Piştî hevdîtinê her duyan li ber kamerayan bi zimanên cuda axivîn. Heta Kazimî got; bila tu welatek dest li karê me yê hundir wernede.

Der barê hûrgilî û naveroka hevdîtina aliyan de waliyê Duhokê ku di heyetê de bû, axivî. Waliyê Duhokê Elî Teter jî ragihandina bi ser PDK'ê re hin agahiyan aşkera kir.

Li ser mijarê Elî Teter agahiyên mîna "Tirkiye ji Kazimî xwestiyeke ku peymaneke weke ya Şingalê ji bo Mexmûrê jî were girêdan." Bi çapemeniyê re parve kir. Ev agahî naverok û asta hevdîtinên bi awayekî aşkera radixe ber çavan. Her wiha sedama ziyafeta qesra Erdogan jî bi vî awayî baştir tê fêmkirin.

Walî Teter aşkera dike ku aliyan li ser derxistina PKK'ê ya ji axa başûrê Kurdistanê jî bi hev re nîqaş kirine û di vê mijarê de nêrînên hêja derketine holê. Wisa diyar e ku li ser hin mijaran li hev kirine ku bi dilekî xweş û geş qala hevkariya xwe dikin.

Di heman hevdîtinê de li ser Mexmûr û PKK'ê hatiye axivîn, Tirkiye di milê tîcarî û ava Dîcle û Firatê de hin soz dane. Diyar e ku di piştperdê de gelek sozên din jî hatine dayîn ku Elî Teter zêde naxwaze naverokê aşkera bike.

Niha raya giştî meraq dike, Kazimiyê ku li ber kamerayan got 'bila kes dest li karê me yê hundirîn wernede', çi bû ku li piştî kamereyan li qesra Erdogan bû perçeyekî hevkariya bi dewleta tirk re?

Gelo li ser maseya ziyafetê kîjan bazarên qirêj hatine kirin ku Kazimî ji gotina xwe ya niştimanperwer gav paşve avêt. Di bedela çi bertîlan de bejna xwe li ber Erdogan tewand.

Waliyê Duhokê Elî Teter dibêje; "Erdogan destekê daye Peymana Şingalê ya di 9'ê Cotmehê de ji aliyê PDK û Bexdayê ve hatiye îmzekirin."

Êdî hemû kes baş dizanin ku ev peyman bi erêkirin û piştgiriya dewleta tirk li ser gelê Şingalê tê ferzkirin. Li herêmê mekanîzmaya ku îradeya gelan tune dihesibîne û hebûna wan bi her awayî înkar dike, dewleta tirk e. Ji ber vê yekê li herêmê peymanên hebûna gelan dike mijara nîqaşê û dest dirêjî li destkeftiyên wan dike, ji derveyî dewleta tirk kes nake.

Bi ser de jî rejîma tirk dixwaze peymaneke weke ya Şingalê ji bo Mexmûrê jî were girêdan. Ji ber tevî hemû êş û zilma dewleta tirk li ser gelê Mexmûrê pêk anîn jî gelê Mexmûrê yê bi nirx û hebûna xwe ve girêdayî, ev 30 sal in bejna xwe li ber hovîtî û zilma dewleta tirk netewandiye, bi van lîstikên kirêt ve dixwazin bi ser bikevin.

Di van peymanan de dewleta tirk armanc dike ku îradeya kurdên azad bişikîne. Li gor wan mafê gelê kurd nîne ku xwe bi xwe bi rê ve bibe ango li gor îradeya xwe ya azad xwe birêxistin bike. Ev dewletên axa Kurdistanê dagir kirine dixwazin bi hemû aliyan ve mejî û hebûna gelê kurd jî dagir bikin.

Em gotina dewleta tirk a 'kurdên herî baş ên mirî ne' ji bîr nekin. Tişta ji bo kurdan rewa dibînin ev e. Lewma pêwîstî heye ku gelê kurd li hebûna xwe, li îradeya xwe ya azad xwedî derkeve û li dijî van lîstikên qirêj dengê xwe bilind bike.

# Hiqûq li gor kesekî tê amadekirin

**Girtina Selahaddîn Demîrtaş û berdana wî her tim ji bo dewletê û Erdogan pirsgirêk e. Ji bo Leyla Guven jî heman tiştî dikare bê gotin. Lewre Demîrtaş û Guven du şexsiyetên polîtîk û xwedî bandoreke civakî ne. Di qada navnetewî de xwedî nav û deng in**

Navenda Nûçeyan

Li aliyekî biryara Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME), li aliyê din biryara girtina hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Leyla Guven rewşa dadgeriya li Tirkiyeyê derdixîne holê. Hevseroka KCD'ê Leyla Guven di 21'ê kanûnê de hat binçavkirin û di heman rojê de Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) jî der barê hevserokê HDP'ê yê berê Selahaddîn Demîrtaş de biryara berdanê da.

Wekî tê zanîn 4'ê mijdara sala 2016'an dema Selahaddîn Demîrtaş hevserokê HDP'ê bû, bi biryara Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê bi darbeyeke polîtîk hat binçavkirin û paşê bi heman perspektîfa polîtîk dadgehê biryara girtina wî da. Demîrtaş ji vê dozê hat tehliyekirin lê dema li ber berdanê bû serokomar Erdogan daxuyaniyek dabû û gotibû ku ji bo Demîrtaş dernekeve em ê bi sedemeke din wî di girtîgehê de bihêlin. Li ser vê daxuyaniyê Demîrtaş 20'ê Îlona 2019'an, cara duyem bi biryara dadgehê hat girtin.

**Hiqûqa li Tirkiyeyê**

DMME'yê got ku jixwe hinceta girtina yekem û ya duyem heman hincet in. Ji ber vê yekê hincetên girtina duyem ji ber ku hincetên girtina yekem in, biryara berdana Demîrtaş dan. Piştî biryara DMME'yê ji serokomarê AKP'ê heta wezîrê karên hundir daxuyanî dan û gotin ku biryara DMME'yê ji bo wan 'pûç e'. Helbet ev helwesta dewleta tirk nîşan dide ku tu wateya hiqûqê li vî welatî nemaye û dadgeh û hiqûq li gor berjewendiyên 'kesekî' tên amadekirin.

**'Em mafdar in'**

Selahaddîn Demîrtaş têkildarî biryara DMME'yê li ser hesabê xwe yê medyaya civakî twîtterê bersiva daxuyaniyên li dijî biryara DMME'yê da. Parvekirina Demîrtaş wiha bû: "Hûn wisa li qîrîn û bangkirina wan nenêrin. Hewl didin tirs, qelsî û tengezariya xwe veşêrin. Wêrek bin û li hemberî zilmê xwedî sekin bin, ez wisa dikim. Em mafdar in, bihêz in û bimoral in. Em ê tev bi hev re qezenc bikin. Meraqan nekin, Tirkiye ji çeteya 5 kesî mezintir e."

**Girtina Leyla Guven**

21'ê kanûnê der barê hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Leyla Guven de 22 sal û 3 meh cezayê girtîgehê hatibû birîn û di saetên şevê de ji aliyê polîsan ve hat binçavkirin. Guven ku gelek caran hatiye girtin û binçavkirin piştî ku derket edliyeyê ceza lê hat birîn û ew şandin Girtîgeha Jinan a Amedê, lê di heman şevê de ew birin girtîgeha Xarpetê.





**Bertekên li dijî girtina Guven**

Li ser girtina Guven, rêxistinên jinan û raya giştî nerazîbûn û bertek nîşan dan. Her wiha raya giştî ya cîhanê jî bêdeng nema. Zimanzan û aktîvîst Noam Chomsky û lîderê berê yê Partiya Karkeran a Îngilistanê Jeremy Corbyn jî di nav de, gelek kesayetên navdar têkildarî girtina hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven nameyek nivîsîn. Di nameyê de ji Wezareta Karên Derve ya Îngilistanê hat xwestin ku ji bo berdana Guven bikeve nav liv û tevgerê.

Bi kurt û kurmancî, girtina Demîrtaş jî û berdana Dermîrtaş jî ji bo dewletê û Erdogan pirsgirêk e. Ji bo Guven jî heman tiştî dikare bê gotin. Lewre Selahaddîn Demîrtaş û Leyla Guven du şexsiyetên polîtîk û xwedî bandoreke civakî ne. Di qada navneteweyî de jî xwedî nav û deng in her wiha wekî du kesên polîtîk û têkoşer ên ji bo daw û doza kurdan têdikoşin tên nasîn. Bêguman dewlet jî vê rastiyê dizane û ji ber vê rastiyê wan bi awayekî polîtîk 'dîl' digire. Wisa xuya ye heta dewlet dev ji konsepta qirkirina kurdan bernede, dê li dijî siyastmedarên kurd jî dev ji bêhiqûqiyên xwe bernede. Belasebeb negotine 'hiqûq kûçikê siyasetê ye'.

# Armanca serdana Mustafa Kazimî

Serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazim hefteya borî li gel şandeya payebilind serdana Tirkiyeyê kir û bi serokomarê Tirkiyeyê Tayyîp Erdogan û berpirsên mezin ên Tirkiyeyê re civiya. Di serdanê de ku tenê rojekê berdewam kir li ser dosyayên bi salan e di navbera her du dewletan de bi pirsgirêk in, ên wek ewlehî, aborî, fînans, enerjî, av, girêdana rêya hesinî, vîzeya derbasbûnê û pereyên hatine sekinandî de, axivîn.

Têkiliya her du welatan ji 2003'yan ve di gelek pêvajoyan re derbas bû. Herî dawî ji ber êrîşên Tirkiyeyê yên li ser herêma Iraqa federal û nakokiyên mezin di navbera her du welatan de derketin. Di van rojên ku nakokî ketine navbera wan, Tirkiyeyê pereyên kesayetên iraqî dane sekinandin. Bi hatina serokwezîrê dewleta Iraqê Kazimî ya Tirkiyeyê re, Tirkiyeyê hewl da ku parastina têkiliya di navbera her du welatan de bike.

Endamê KNK'ê, hevserokê Eniya Gel a Demokratîk a li başûrê Kurdistanê û hîndekarê Zanîngeha Duhokê Kamûran Berwarî der barê serdana serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî ya li Tirkiyeyê de axivî. Kamûran Berwarî diyar kir ku ger hikûmeta Başûr helwestê nîşan nede dê Başûr bi temamî bê dagirkirin.

**'Bawerî bi dewletê nemaye'**

Endamê KNK'ê Kamûran Berwarî da zanîn ku sedema serdana Kazimî ya li Enqereyê daxwaza madî û manewî bû û wiha got: "Wisa xuya ye ku Kazimî ji bo Iraqê daxwaza piştgiriya aborî û siyasî ji Tirkiyeyê kiriye. Ji ber rewşa dewleta Iraqê ne baş e. Li aliyekî di nav gel de pirsgirêk hene û çalakî tên lidarxistin û heye ku ev çalakî li tevahiya Iraqê belav bibin; li aliyê din jî gengaz e ku bi destê welatên cîhanê şerek li Iraqê bê destpêkirin. Lewma jî baweriya gelê Iraqê bi dewletê nemaye."



**'Hevdîtin tim li dijî kurdan e'**

Berwarî diyar kir ku hevdîtinên navbera Tirkiye û Iraqê carna bi rengê dualî carinan jî bi tevlîbûna Îranê bi awayekî sê alî pêk tên û axaftina xwe wiha domand: "Tê zanîn ku ev hevdîtin û lihevkirina wan timî li dijî destkeftiyên gelê Kurdistanê ne, lê belê di hevdîtina vê carê de dibe ku li ser çend mijaran rawestiya bin. Beşek jê jixwe di çapemeniyê de aşkera bû. Yek ji mijarên hevdîtinê li ser rêveberiya Şingalê, ya duyemîn li ser PKK'ê, ya sêyemîn li ser meseleya avê, ya çaremîn li ser vekirina deriyên nû, ya pêncemîn jî li ser lêgerîna li rê û rêbazên serweriya navbera Rojava û Başûr (kêmkirina bandora hikûmeta Başûr) bû. Her wiha tê texmînkirin ku mijarên danûstandinên petrolê, çareserkirina meseleya vîzeyê ya navbera her du welatan, cihdayîna şîrketên tirk ên ku Iraq xera kirin hatin nirxandin. Ne diyar e ku di van mijaran de li hev kirine yan na."

Kamûran Berwarî di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku encama hevdîtinê dê tiştekî baş nebe û ev tişt anî ziman: "Tirkiye dixwaze Iraqê ji bo xwe bi kar bîne, ev yek jî wê rewşa Iraqê bêhtir nebaş bike. Berwarî hişyarî da ku 'pêvajoyeke nebaş' li benda Iraqê ye. Rêveberiya Kazimî ya di demeke kurt de bû desthilatdar, erk û bandora xwe nîne ku ji aliyê stratejîk ve mohra xwe li binê peymanan bixe."

Berwarî daxuyaniya waliyê Duhokê Elî Teter a li ser kampa penaberan a Mexmûrê jî nirxand û ev tişt anî ziman: "Dibe ku serokomarê Tirkiyeyê ji waliyê Duhokê xwestibe ku mîna Şingalê heman rewşê bîne serê wargeha Mexmûrê. Ji ber ku wargeha Mexmûrê her tim tev li planên Tirkiye û Iraqê yên li dijî kurd û Kurdistanê hatiye kirin."

**Bi kêrî kurdan nayên**

Berwarî diyar kir ku hevdîtinên navbera Tirkiye û Iraqê tu carê bi kêrî kurdan nayên, hevdîtina dawî jî wê ji bo PDK'ê jî bibe pirsgirêk, ji ber ku hewldanek li ser girtina deriyê sînor ê Îbrahîm Xelîl heye.

Her wiha Berwarî destnîşan kir ku bazirganiya navbera Tirkiye û Başûr wê ji ber vê yekê derbeyeke mezin bixwe û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Divê ev yek bi rengekî aşkera bê gotin; dewleta tirk dixwaze başûrê Kurdistanê dagir bike. Ji aliyê aborî, leşkerî û civakî û siyasî ve Başûr dorpêç kiriye. Ji ber ku ev mesele ne tenê dagirkeriyek li ser Şingal û Rojava ye, dixwaze tevahiya Kurdistanê dagir bike. Dibe ku her dewlet gefê li rêveberiya başûrê Kurdistanê bixwe yan jî daxwazên xwe jê hebin, lê belê ev yek nayê wê wateyê ku rêveberiya Başûr serê xwe li ber her daxwaz an jî gefê bitewîne, divê rêveberiya başûrê Kurdistanê li dijî vê yekê helwestê nîşan bide, naxwe armanc diyar e; ew jî dagirkirina başûrê Kurdistanê ye. Eger helwestek, nerazîbûnek nebe wê bigihêjin armancên xwe. Naxwe wê destkeftî hemû ji dest biçin û mîna di dîrokê de pêk hat wê çarenûsa kurd û Kurdistanê bikeve destê van dewlet û hêzan." ***SILÊMANÎ***

## Jinan ji bo fihûşê dişînin Lîbyayê

Televîzyona Sky Newsê têkildarî Efrînê raporek belav kir û ragihand ku komên girêdayî dewleta tirk jinên efrînî ji bo fihûşê dişînin Lîbyayê.

Li gorî rapora Sky Newsê dispêre şahidên jin ên bûyerê, komên li Efrînê jinên efrînî bi darê zorê û ji bo karê fihûşê bi wan bidin kirin, wan dişînin Lîbyayê û di nûçeyê de wiha hatiye gotin: "Jinan aşkera kir ku erdê Efrînê bi xwîna jinên ku ji ber destavêtina hovane derketine, tijî bûye."

Sky News balê dikişîne ser kiryarên nemirovî yên li Efrînê û destavêtina jinan û bi bîr dixe ku mîna çeteyên DAIŞ'ê di sala 2014'an de li Şingalê bi jinên êzidî kiribûn, niha jî jinên Efrînê difiroşin bazirganên qeterî.

Sky Newsê di nûçeya xwe de diyar dike ku gelek jinên kurd di girtîgehên komên girêdayî dewleta tirk de winda ne û gelek ji wan birine Lîbyayê û wiha dibêje: "Jinên tên revandin bi rêya deriyê sînor ê Kilîsê, gundê Xelîl û deriyê Hemamê, derbasî Tirkiyeyê tên kirin."

Beriya niha jî Neteweyên Yekbûyî raporek pêşkeş kiribû ku tê de li Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê behsa binpêkirin û kiryarên dijmirovî yên komên girêdayî dewleta tirk kiribû û Tirkiye wekî berpirsê wan kiryaran nîşan dabû û xwestibû hesab bê dayîn. ***LONDON***

## Sîxurên Tirkiyeyê dê bên darizandin

Rêxistina Îstîxbaratê ya Danîmarkayê (PET) der barê alîgirên AKP'ê ku muxalîfên dewleta tirk û kurdan ji bo dewleta tirk îxbar dike, lêpirsîn dabû destpêkirin. Di encama lêpirsînê de jineke temen 47 salî bi sedema sîxurî ji dewleta tirk re kiriye, daxwaza darizandina wê hat kirin.

Îstîxbarata tirk gelek siyasetmedar û çalakvanên ku li Ewropayê mafên xwe yên demokratîk bi kar tînin, krîmînalîze dike. Di encama karên îstîxbaratê de gelek welatiyên ji bakurê Kurdistanê û muxalifên Tirkiyeyê nikarin bikevin Tirkiyeyê. Der barê gelek ji wan de doz hatine vekirin, biryara girtinê hatiye dayîn û ketin û derketina wan a welat hatiye qedexekirin.

Sîxuriya ku bi salan e li Ewropayê tê kirin, li gorî qanûnên Danîmarkayê sûc e. Dozgerî li gel cezayê girtîgehê daxwaza dersînorkirinê jî dike. ***KOPENHAG***

## Ji hikûmeta Başûr daxwaza balkêş!



Berdevkê hikûmetê başûrê Kurdistanê Dr. Cotiyar Adil di civîna çapemeniyê de diyar kir ku ji Amerîkayê xwestine hêzên xwe li ser sînorê di navbera rojava û başûrê Kurdistanê de bi cih bikin. Her wiha Dr. Cotiyar Adil aşkera kir ku başûrê Kurdistanê ji bo niyeta baş li gel şer nîne, ev yek xwestiye. ***SILÊMANÎ***

# Rewşa zarokan di pandemiyê de 2

Cemîl Guneş

Mirov dikare bi hezar gotinî qala başiyên lîstikan bike û pesnê lîstikan bide; çi lîstikên malê çi yên derve. Her lîstikek her wiha pêvajoya hînbûna xwezayî ye ji bo zarokan. Lîstik divê wek heqê zarokan neyê qalkirin, wek avê, wek nên û wek zimanê zikmakî perçeyeke jîyana wan bixwe ye. Loma di nav malê de wexta ku lîstik hatin lîstin divê em li gor wê tevbigerin. Di vê pêvajoyê pandemîyê de tişta girîng bijartina lîstikan û amûrên lîstikê ne. Her lîstik li her derê nayê lîstin, her amûr di her lîstikê de nayê lîstin û ya din jî ev e ku her lîstik û amûr jî bi her zarokî re nayê lîstin.

Ev krîter jî ji cudahiya zarokan tê. Divê neyê jibîrkirin ku her zarok ji hev cuda ne. Ev cudahî, ne kêmasî, ne qelsî yan jî zêdeyî ye. Her yek ji wan rengekî xweşik û geş in. Hewce bike em hinekî din jî bi ta û derzî bikin, belkî pêdivî bi van gotinên sade heye. Her pitik wexta ku nû ji dayika xwe dibin dikevin nav pêvajoya naskirinê. Ev naskirin bi xwe dest pê dibe, ango pêşî xwe ji dinyayê vediqetîne û paşê derdora xwe ya nêzîk û dî dû re derdor. Kêm tişt hene ku zarok merak nekin, wekî din gelek tiştên ku ne li ser bala me mezinan e, li ser bala zarokan e. Hin jîr û zana hene ku zarokan mîna zanyarekî bi nav dikin û hin ji wan jî çêbûna zarokekê wek surprîzeke dinyayê bi nav dikin. Zarok çawa ku ji aliyê fizîkî ve ji hev cuda ne, her wiha ji aliyê hest û fikir ve jî ji hev cuda ne. Bala hinekan deng, bala hinekan reng, bala hinekan nivîs...

Êdî dimîne ku kesên malê li gorî temen û bala zarokan biryara lîstikan û amûran bide. Carinan divê ew fersend ji bo zarokan jî bên dayîn û ew bixwe jî lîstikan biafirînin. Divê em pêşî bi zarokan bidin hîskirin ku pîvanên lîstikan dikare biguhere ango ne ferz e ku bi pîvanên hişk lîstik bê lîstin. Her wiha ne ferz e ku em lîstikekê ji derve bînin û bi wan bidin lîstin çunkî wek ku me li jor jî qal kir, bal û hunerên her kesî ji hev cuda ye. Em lîstikên xwe bi xwe çêkin dê zarok bi afirîneriya xwe jî bihesin û bêguman dê zêdetir bixwe bawer bin. Di lîstikê de armanc kêf û naskirin e. Beriya ku lîstik dest pê bike divê ev neyê jibîrkirin. Divê di nav lîstikê de kesên dilîzin dev ji rolên xwe yên nav malê û derve berdin. Ango divê bav di lîstikê de bavtî neke, dê dêtî, bira biratî û xwişk xwişktî neke, her endamekî malê bi taybetiyên xwe hene û rengekî xweşik in. Çunkî rolên me yên malê li ser zarokan otorîteyekê çêdike û ev jî rê li ber rehetiya zarokan digire. Di nav malê de her tişt dikare bibe amûrekî lîstikan. Ji goreyan bigirin heta balgîfan, ji kevçiyan bigirin heta beroşan, ji kaxizan bigirin heta pênûsan.



Helbet wek ku me li jor jî got her amûreke malê amûreke lîstikan e jî. Ez ê li jêr çend pêşniyarên lîstikan bikim.

•Hemû ferên goreyên malê ji hev vekin li odeyeke malê rû bikin. Li nav hev bixin û bila li hemû odeyê belav bibe. Bila wext dest pê bike û her kes di demeke herî zû de cotên goreyan bibînin û bikin wek gokekê. Piştî ku her kesî goreyên xwe çêkir, bila yek ji wan destê xwe bike wek çemberekê û bike basket. Bila yên din jî goreyên xwe bavêjin basketê.

***Nîşe:*** *Dê ev lîstik konsantrasyona zarokan bi pêş ve bibe, dê tiştan zûtir ji nav du derxin û dê bîra wan xurt bike.*

*•Bila hemû kesên malê wek xêzikekê li kêleka hev rûnin. Bila yê serî tiştekî ji guhê kesê li kêleka xwe bibêje û wisa dewam bikin. Heta gihaşt dawiyê îjar gotinê jê bixwazin. Bila herkes bibine bê ka gotin bi veguhastinê çawa diguhere û bila tesbît bikin bê ka gotin li ku guheriye.*

***Nîşe:*** *Dê ev lîstik hunerên guhdarkirinê yên zarokan bi pêş ve bibe her wiha dê bala wan xurtir bike.*

*•Bila yek çavê xwe bigire û yek din jî tiştekî bide destê wê. Kesê ku çavê xwe girtiyê bêyî ku bibîne bila fam bike bê ka çi di destan de ye. Tiştên cuda bi kar bînin ku carinan bi bêhnê carinan bi deng û carinan jî bi destan fam bikin.*

***Nîşe:*** *Dê ev lîstik sehekên wek destdan, bêhnkirin, guhdarkirin û tahmkirin yên zarokan bi pêş ve bibe. Ev pêşveçûn jî dê rê li ber hestiyariya wan veke.*


*•Hemû ampûlên malê bigirin û ji zarokên xwe re çîrok û çîrçîrokan vebêjin. Bêyî ku hûn rêz û bûyera çîrok û çîrçîrokan xera bikin, hûn dikarin carinan tiştên bala zarokan bikişîne jî lê zêde bikin.*

***Nîşe:*** *Bi vêya zarok hinekî ji civat û şevbihêrkan hez dikin û hunerên wan yên guhdarkirinê gelekî bi pêş ve diçin.*

*•Bi hev re li malê govendê bigirin ku çanda xwe baştir nas bike. Li straneke Zarok TV'ê guhdarî bikin û jiber bikin bi hev re ku hûn bi hev re bibêjin. Bila her kes kaxizekê bigire û wêneyekî xêz bike û wêneyên hev şîrove bike. Di hundirê malê de veşartokê bilîzin. Çavgirtîkê bilîzin ango bila yek çavên xwe bigire û kesên din bi dengên wan bigire. Bi hev re xwarinê çêbikin. Bi hev re malê paqij bikin.*

Lîstikên heta xala 4'an ên di heşê min de ne. Di xala 5'an de pêşniyazên biçûk hatine rêzkirin. Helbet hûn dikarin bi zarokên xwe re lîstikên zaroktiya xwe jî bilîzîn. Ev dê fersenda berawirdkirina pêşeroj û paşerojê jî bide zarokan.

Çi pandemî û çi rojên asayî, ev tişt bên kirin bêguman malbat dê zarokên xwe baştir nas bikin. Dê malbat ji gelek aliyan ve bi hunerên zarokên xwe zanibin. Ev jî dê bibe avantajek ku malbat li gor hunerên zarokên xwe derfetan ji zarokan re peyda bike û zarok jî ji bo pêşveçûna xwe dê zêdetir xwe nas bikin û bixwe bawer bin. Zarok ne "mezinên biçûk" in, ew ne lewheyekî vala ne. Zarok rengek ji xwezayê ne, divê em wan wek xwe qebûl bikin û pêşiya wan nebirin. Em bihêlin bila bi rengê xwe hebin û heta ku ji destê me tê em dinyayê wek dilê wan û bi dilê wan, xweş bikin.



Seyidxan Anter

# Kew ne dijminê serê xwe ye!

Di strana "Evdal im" de, Hesen Cîzrawî li ser "evîna xwe û keleşgevra xwe ku tiştê hatiye serê wan, nehatiye serê Mem û Zînê" dibêje:

*"Ewrê reş û tarî li raserî keleha zinara Mêrdînê,*
*qeb-qeba kewê gûz vê êvarê dixwîne li ser hêlînê.*
*Fermanê..."*

Wa diyar e li tenişta qaz û quling, bilbil û kevokê, çûka ku di folklor û wejeya kurdî de gelekî cih girtiye, kew bixwe ye. Di civata kurdan de kew, nemaze **kewê/a gozel** bûye sembola dengxweşî, nazelîn, kubarî û desthilanînê û hin wesfên din ên neyînî ne.

Loma jî îlusrationa hin stranên Mihemed Arifê Cizîrî wek ya Qasimê Meyrê û hin qapaxên CD ên wî bi weneyên kewê hatine xemilandin. Strana "Kewê" ku Mehemed Arifê Cizîrî dibeje, belkî we jî mîna min gelek caran lê guhdarî kiribe.

Li ser hin paketên bazirganan nemaze yên ji başûrê Kurdistanê, kew danîne û hin rêxistinên polîtîk jî carcaran kew ji xwe re wek motîf hilbijartine. Di warê sosyal de, gelek caran kew û kurdan dişibînin hev. Kew bûye mijareke civaka kurd.

Li bakurê Kurdistanê xelk hene ku ji xwe re kirine kar û ticareta kewan dikin. Ew çêlkewan digirin wan kedî dikin, mezin dikin, basko dikin û difiroşin nêçîrvanan.

Li welatên Skandinavyayê nêçîra çûkên mîna kewan dibe. Li gor destûr û fermanan, li cihên taybet û bi hejmareke diyar ev nêçîr pêk tên. Li Kurdistanê nêçîra kewan bûye hobî û nexweşiyeke ku şêwêyên vê nêçîre jî gelek in.

Nêçîra kewên nêr û mê hem ne mîna hev in û hem jî dema wan ne yek e. Nêçîra mêkewê payîzê û ya nêrkewî jî biharê ye. Çend şêweyên nêçîra kewên nêr hene. Yek jê a bi **kewê ribat** e ku ji kewî re li erdê cih çêdikin, li hawirdora wî, dahfikan ( yên ji mûyên terya hespan hunandî) diçikînin. Dibêjin kewê ribat şerxwaz e, lê **kewê celabserdar** bi şiklekî din e. Ew bi şaxê darê ve vedikin. Rengek din ê nêçîra kewan jî bi çîtê ye. Li ser çapanekî mezin wêneyê kewekî datînin. Kew tên xwe li wêneyê li ser çîtê didin û tên girtin...

Nêçîra mêkewê cuda ye. Nêçîrvan, an mêkewê bi darê vedike yan jî wê datîne cihekî bilind û li dora wê dahfikan vedidin. Dûre jî nêçîrvan jî çifteya wî hazir, xwe di kozikê de vedişêre û piraniya caran kewên tên mêkewê bi çifteyê dikuje. Helbet mêkew û barê wê jî girantir e!

**Kewên bejî**, li gor xwe çûkên din li warê xwe naxwazin. Her wiha êrîşî kewên **kedî** û girêdayî dikin, lê lingên wan dikevin dahfikan, xwe didin dest, tên kuştin û ji nêçîrvanan re dibin şîv an jî paşîv.

Hin şêweyên nêçîra kewan jî di demsala zivistanê de dibin. Wek ku tu dizanî fira kewê kin e. 200-300 m difire û xwe datîne ku cardin bifire. Serdema **abûra** kewan, çaxa erd befirê digire xelk derdikevin **hêlê**. Ji ber seqemê û şilbûna perîyên baskên xwe, kew hew dikare bifire. Mirov jî kewan bi destan digirin.

Cureyek din a nêçîra kewan jî **nêçîra reş** e. Li warên ku befir gelekî li wan dibare (wek mînak Bîngolê) xelk li berpalan ji befrê kozikan çêdikin, ta ku bi qasî xalîyekê reşayî bimîne befrê dimalin û xiltê (zad) lê direşînin. Dûre jî diçin temaşe dikin ka kew hatine xilt xwarine yan na. Ger xwaribûna, berbanga serê sibê nêçîrvanan xwe di kozikên xwe de vedişartin û çavderî li kewan dikirin. Gava ku kew dihatin û xilt dixwarin, nêçîrvanan bi sîlahên xwe gelek kew dikuştin. Çi mê û çi jî nêr.

Bûyer û serpêhatiyên kurdan ên van rojan kew anîn bîra min. Îcar gava te got kew, nikilê wê/î jî sor e!

Peyva ku gelek caran dubare dibe, mîna rastiyekê di nav xelkê û civatê de cih digire. Kurdan gotiye; "Kew dijminê serê xwe ye". Çaxa refek kew tê ser avê , bi rêzê yek nobetê li yê avê vedixwe, digire. Na nexêr, kew ne dijminê serê xwe ye, xefik dijminê serê kewê ye!

***Têbînî:***

***Sipasî li Rizoyê Xerzî, Beteyê mizîzexî, Muslumê dêrî û Amed Tigrîsê licî dikim ku ji min re bûn rêber û çavkanî.***



# Sersala we pîroz be!

Me saleke tije êş li dû xwe hişt û derbasî saleke nû dibin. Bi hêviya sala nû bibe sala aştî, aramî û azadiyê em wekî Komeleya Rojnamegeran a Dîcle û Firatê sersala gelên cîhanê, Rojhilata Navîn û ya gelê kurd pîroz dikin. Bi vê mebestê em sersala hempîşeyên xwe yên li ser kar û yên ji ber xebatên xwe yên rojnamegeriyê hatine zindanîkirin pîroz dikin û azadiyê ji wan re dixwazin.

DFG
DİCLE FIRAT GAZETECİLER DERNEĞİ

**Komeleya Rojnamegeran a Dîcle û Firatê**

# Sersala we pîroz be!




Bi salan e em dayik, bi kezebeke şewitî û bi dilekî şikestî ji bo aramî, azadî û aştiyê bi dengekî bilind bang dikin. Bi hêviya ku sala nû bibe dawiya êş û azarên me û bi xwe re rojên xweş û azad û aştiyeke birûmet bîne welatê me. Bi van hest û dilînan em sersala we pîroz dikin.

**Dayikên Şemiyê**

# Sersala we pîroz be!

2020 saleke wisa bû ku di vê salê de herî zêde keda mirovan hat xwerin. Sala 2020'an wekî saleke nexweş û bi nexweşiyê di bîra civakê de ma. Em bi hêvî ne ku sala nû ji bo welatê me û hemû cîhanê bibe sala keda azad, aramî, aştî, azadî û wekheviyê. Bi van hestan, em bi hêviya civakeke bitendurist, xwezaya parastî û keda azad, sala 2021'ê li gelê xwe pîroz dikin.

KESK 1995

Platforma Şûbeyên KESK'ê yên AMED'ê

# Sersala we pîroz be!

Ji bo siberojên xweştir, em ê bi rengekî qerebalix li hev necivin, xwe dûrî hev bihêlin, sala nû wiha li malên xwe pêşwazî bikin û bi hezkirinê hembêz bikin. Bi hêviya ku sala nû bibe sala aramî û aştiyê, em sersala we pîroz dikin.

DİYARBAKIR TİCARET VE SANAYİ ODASI 1883

Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê ya Amedê

# Serrîyêk ra seserre vetiş



Av. Cemile Turhalli

Ma ameyê peynîya 2020î. Labele çi heyfo ke Tirkîye de ne pênîya zilm ne zî ê zilmkaran nêameyo. Tirkîye de zilmo pîl reyna eno serre de serê şarê kurdî ame. Awankerdişê komarî ra nata, kiştişê hezar kurdan bi Şeyh Saidî dest pêkerd û Dêrsim, Zîlan, Agirî, Cizîr û Nisêbînî dewom kerdo û enka zî dewam keno. Se kenê nêkenê nêeşkenê eno civak biqedênî, vindî bikerê û teslîm bigêrî. Nêeşkenê sere kurdan bitewinî û înan kor bikerî. Çimki kurd bi çim xo ameyê dinya. Ekê merdim pê çimanê xo her çî dîbo, nêeşkeno çimanê xo ra bivêro. Çim tenya vînayîş nêdono merdiman. Çimê merdimî qalkerdiş, wendiş, heskerdiş, zanayîş û vîrêk danê merdimî. Merdim pê vîrê xo cuya xo dewom keno û hewnanê xo vîneno. Qiymetê vînayîşî semedê merdimî zede yo. Çimkî merdim pê vînayîşê xo ewnîyeno cuya xo.

Coka ra çiqas kurdan ser zilm zêde beno, heqê înan ê pawitişî zî hende zêde beno.

Nê seserre de îdeolojîya dewlete, estbîyayîşê xo û ganîtîya xo, vindîkerdiş û qirkerdişê kurdan de dîyo. Hukm tena nêameyo serê kurdan. Kurdî bi serran tofanan ra para xo girewtî. Dewlete çiqas zilmê xo dewam kerde, kurdî zî hnde serewedaritişê xo dewam kerdî.

Tarîxê dinya de wextê komunale de merdimatî seyî cuyêka kollektîf ciwîyayêne, hukmtî eno cuya kollektîfî xerepna. Dewlete zî serê hukmtî ra virazîya. Labelê raştîyêk esta ke o zî zehf muhîm a. Dewlete nêeşka wina rehet bigîro destê xo. Îdeolojîya dewlete serê manîpulasyon û terskerdiş ser bî. Vatêne semedê rehetîya xo azadîya xo ra fek vera bidêne. Eslê xo de vaştêne wina vaja; semedê cuya xo, cuya xo ra fek vera bidêne. Semedê şima dewlet esta, dewlet ha paştîya şima de ya. Eger şima dewlete ra paştî wazenî, ganî şima werdene xo ra, mulkê xo ra, azadîya xo ra û cuya xo re fek vera bidî. Bi eno hawa cuya merdiman girewte xo deste. Ge-ge înan semedê talan û dagirkerîye bena herb, ge-ge zî bi zerrîwaştox merdiman semedê karanê xo kena koleyê sîstemî. Ganî merdim xo vîra nêkero ke dewlete tena pê zilm nê çîyan nêgirewte xo dest. Zaf reyan pê ters, xapênayîş û manîpulasyonî ser kewte. Ge-ge serewedarnayîş zî virazîyayêne. Pê şiddet şîyêne înan ser o. Îqtîdar semedê rehetîya xo rehetîya sewbînan qebul nêkeno.

Zafaneyê îqtîdaran de ters esto. Ters qebulkerdişêko zimnî ano û qebulkerdiş zî beno sebebê lez roniştişê hukmî. Çîyêko xirab zî esto. Hukm qet mird nêbeno. Vêşonîya ê dinya rê felaketanê pîlan ano. Vêşonîya ê şer ano, vêşonîya talan û dagirkerîye û mergî ano. Vêşonîya ê talankerdişê xoza ano, vêşonîya ê zedêra feqirê ano û vêşonîya ê sê nêweşîya globale Covîd 19î ano.

Serra 2020î de vîşêrê grûbêk îmtîyazî xeylê kesî mecbur koçber bîyî. Xeylê merdimî herra xo ser de merdî, xeylê kesî rayîrê dewletan ser de telef bîyî, xeylê kesî sefaletî vera merdî û xeylê kesî zî tena semedo ke nêmirê debara xo kenê. Dewletê vernan ra heta dewletenê neweyan, merdimatî qet rehetî nêdî.

2020 de nêweşîya Covîd 19 eşkerî bi ke xelasîya merdimatî dewletan ra nêbena. Dewlete merdimanê xo semedê ekonomîya xo lez çim ra vejena. Nêeşkena yew maske peyda bikera. Çimkî heyatê merdiman nêno vîrê dewlete. Çimkî herçî ra ver menfaatê wayirê karî û menfatê gruba wayîrê îmtîyazî muhîm a.

2020 de operasyanê dewlete sey guleyan vara serê sarê kurdan. Dinya xo nêweşîya pandemî ra pawit labelê Tirkîye eno bela nêgirewt ser xo. Nêweşî kerd yew firsend. Neverda înson bêrî tê het. Nêverda sazî kare xo bikerê. Nêverda Baro veçînayîşê xo bikera, labelê semedê xo zî veyveyan viraşte û xebatanê xo qet nêda vindertiş. Heyatê xo re çêk ra nêbî û texsîr nêkerdî, la ê merdimanê bînan ra, muhalefet ra nêverda ling bierzo.

2020 de hona roj bi roj cinî ameyî qetilkerdiş. Gedê ameyê îstîsmarkerdiş. Tecawuzkarî zî pê cezakerdiş ameyî xelatkerdiş.

2020 de zehfina sîyasetmadarê muhalîfî ê kurdan gurewte û eşt hepis. Ê zî neheq nîyî. Kurd zî cay xo de nêvinenî. Sarê înan her tim berzo. Goşê înan her tim akerde yo. Çimê înan sey morcele ho ver goşanê înan de yo. Morcela heywanêk qijkeka labelê hukmê ci pîl o. Eger bikewa goşanê ga, ga nêseteryeno xo erzeno war. Ga xo çendêk bi erz war govdê xo ser keweno. Govdê ey vera vera ey ra beno giron. Nêzano se bikero, nêzano seyî xo bixelesno, qerîtîya xo ver, xo ken ker. Batbatpê fam keno, seyî xo na rewşe ra bixelesno. Xo tirra erzeno war. Pênî de xo, xo rea xelesneno. Labelê o wext beno tirm.


Kurd sê verîn nîyî qederê xo teslîm yew binan bikerî. Mezgê kurdan de serewedartişê civakî esto. Heyalê kurdan wayîtî û biratîya dinya yo. Heyalê kurdan heqê xoza yo. Xoza maya dinya ya. Bê xoza wayîtî û biratî nêbeno. Heyalê kurdan seyyewbînanîya cinî û camêrdan o.

Têkoşînê heqî ê kurdan sey awa ke erd ra vejîyeno. Senî ke awe yene de herre ra safî bena û bena vila, senî ke rayîrê xo vînena û xo resnena çem û dima ra xo resnena deryayan, kurdî zî rayîrê xo dîyî û rayîrê herikîyayîşê azadîye de gam bi gam aver şonî.

Serra 2021 ê morceleyan û pelpelikan pîroz bo...



# Pêvînayîşê Erdogan û Kazimî bazarîya serê Mexmûrî yo



Mahîr Uzmez

Eno rojan de Qesra Erdoganî semedê sîyasetmedaranê Iraq û Herema Kurdistanî biyo rayîrê awî. Yew sîyasetmedar şono ay bîn yeno. Peynîya her zîyaretî zî hêriş û zext ser yew bîyayişê kurdan vêşî beno.

4ê aşma Êlulê Neçirvan Berzanî, 27ê aşma Teşrîna Peyêne Mesrur Berzanî û tewr peynî 17ê aşma Kanûne de Mustafa El-Kazimî hameyê Anqara.

Gelo Anqara de ser veraroja ma çi yeno qalîkerdiş? Kam çi qeraran ser azadîya kurd û Kurdistanî gêno. Heqê ma çinyo ke ma zî naveroka enê pêvînayîşan bizanê û goreyê enê ma zî qalî bikê. Heta enka yew derheqê navaroka enê pêvînayîşan raya pêroyin rê eşkerayî nêdayo.

Ez wazena eno hewte ser enê mijaran vindera.

Ziyaretê Kazimî medyaya Tirkîya de wêş ca nêgirew. Sedem zî yeno watiş ke Erdogan eno pêvînayîşan de nêresayo armancê xo.

Onca zî yew dîmen kewt tora cîvakî ser û ma pey hesîyayî ke Anqara semedê razî kerdina Mustafa El-Kazimî yew mesref ra texsîr nêkerda. Saz û muzîk, keyf û weşî...

Polo binra zî memleketî de bi mîlyonan mêrdimê feqîr, veyşan û teyşan estê...

Mi cor de va; mijara ma ena xal nîya. Mijara ma; bazarîya ser veraroja kurdan a.

Pêvînayîşê Berzanî ra pey peymana Şengalî terafê Hewlêr û Begda ra ameybî îmza kerdiş. Goreyê peymanî, wazêno Şengal bêpawitiş bimano û şarê ma yê Êzidî bêstatu bimano. Coka eno peyman terafê şarê Şengalî ra bi namêyê peymanê îxanetê ameybî qebûl kerdiş û şarê Êzidî eno peyman protesto kerdibî û hema zî bi çalakî û protesto berdewam kenê.

Şîyayîşê Berzanî yê Anqara semedê şarê Şengalî bî talukaya zaf pîli û şarê Şengalî enka mecbur mendo derdê hêrîşê DAIŞî yew ca de verdo û semedê statuya xo verva Hewlêr, Begda û Anqara tekoşîn bikero...

**Zîyaret hame hedefgirewtiş**

Pêvînayîşê Erdogan û Kazimî de yeno famkerdiş ke mijara yewin kurd û Kurdistan bi. Nê tenê kurdê Bakûrê Kurdistanî, statuya kurdê Rojava heta ke şênê vacê statuya kurdê Başûrê Kurdistanî zî bîya mijar.

Çiyo ke referandumê xoserîya Kurdistanî ke 2017 de ameybî viraştiş, tekilîya hukûmatê Başûrê Kurdistan û Iraqî zî herimnay bi, labelê tekilîya Tirkîya û Iraqî newera ganî bibî. Coka yeno famkerdiş ke pirsgirekê Başûrê Kurdistanî û Iraqî zî amey qesîkerdiş û dewleta Tirkîya wazena bi eno zayifîya Begda û Hewlêrî kar bîyara. Çiko mesele Begda û Hewlêrî referandum ra pey hama zî safî nêbîya. Begda butçe ra heqê Hewlêrî nêdena, Hewlêr zî bê îznê Begda Petrol roşeno. Eno rewşe ra Anqara zî feyda geyrena û wazena ser Hewlêr û Begda zextê xo xişin bikera.

**Anqara çi wazena?**

Bersiva enê pirsî eşkere werte de yo. Anqara wazêna her parçê Kurdistanî de kurdan bêstatu verda û kura de tikî statuya kurdan esta, ewca zî biherim na.

Ma rayna tadî ser zîyaretê Kazimî. Heta ke Walîyê Duhokî Elî Teter bahs nêkerbî, haya yewî navarokê eno pêvînayîşî ra zaf çinî bî. Walîyê Duhokî zî mîyanê heyetê Kazimî de bî û ci reyde şîbî Anqara û Qesra Erdoganî de bikeyf û weşî îxanetê kurdan mîyan de cayê xo girewtî bî.

Elî Teter 19ê aşma Kanune de tewrê yew qenalê Televîzyonî bî û yew reyêk de fekê xo ra vet û va: "Tirkîya; Hewlêr û Begda ra waşt ke peymanê Şengalî tede yew peymano newe semedê Mexmûrî zî bêro amadekerdiş." Elî Teter bi eno îtirafê xo eşkere kerd ke peynîya peymanê Şengalî de zî Anqara esta.

Yeno famkerdiş Anqara reyna bi zayifîya kurdan û bêgiretîya Begda semedê xo karana û wazena penabêrê Mexmûrî ke serra 1993î ra heya enka warê xo ra verva zilmê dewleta tirkî koç bîyî, penaber bi reyna wêran bikera û çolanê Iraqî de perîşan bikera.

Seke mi va; kam kurara bêro Anqara mijare yewin qetilkerdişê kurdan beno, ameyîşê Kazimî reyde zî ana haseno ke penaberê Mexmûrî bibê qurban.

Çîyo ke zerra mi dejnena kayê Anqara û Begda nîyê. Şêrikbîyayîşê Hewlêr yan zî kayê Hewlêrî bî. Ez îdarekedoxê Hewlêrî ra tena yew qal vana; Fek eno sîyasetî ra verdî, ewro Anqara û Begda verva kurdan şima kar ana û meyştî tadêna şima ser. Xo rê aqil bê...



## Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## 6 aşman de 6 mîlyonî

Wexto yew vaco "Nazê" merdim vano qey qalê namey pîrekêk keno. Wexto dewam bikero vaco "Nazê Nêrgiza Hewşê" merdim vano qey nameyê deyîrêka klasîk yê kurdî ano ziwan. La nê. "Nazê Nêrgiza Hewşê" nameyê deyîrêk o.

Ma deyîr çi ya? Heta enka bi hezaran, bi des hezaran, belkî bi sehezaran deyîrê kurdan hameyî arêdayîş, vatiş û hameyî nuştişî. Erê, enî heme raştê, la ene mesela meselayêk bîne ya.

Erê deyîr, yanê deyîra "Nazê Nêrgiza Hewşê" pîyaseya muzîkê kurdî sero bin kerd. Deyîre dinyay muzîkê kurdî ser û bin kerd.

**Bêrê ma qal bikerê...**

Vatişê deyîre hetê muzîkar Şêro Hindê ra hame nuştişî. Muzîkar Mehmûd Berazî muzîkê cay viraşto û hunermendanê Hunergeha Welat ke Rojava de xebatey muzîkî kenê deyîre arda serê ziwanî. Û Komîna Fîlman a Rojava qeybî ene deyîre klîb viraşte. Hunermendê Hunergeha Welat klîb de kay zî kerdî.

Înan 23'ê gulana 2020'an de klîb ro kanalê xo yê Youtube bar kerdo. Û mesela zî tîya dest pa kerda: Klîab seranserê dinya de bî vila; çiya, kamco quncik de kurdêke bîbî deyîre balê cê anta.

Enî 6 aşman de 6 mîlyonî zêdeyêrî merdiman serê Youtube de goş dawo deyîre. Înan ke deyîre ro kompîturanê xo bar kerda, ê ke deyîre kerda usb û keye, erebe û cay karê xo de goş dawo ci zî ma hesab nêkenê...

Heta enka ti deyîrek kurdî mîyanê 6 aşman (mengan) de endêke nêbiya vila.

"Nazê Nêrgiza Hewşê" ana bîya vila ke tûtê kurdan ke şiyê eskerîyê tirkan, înan bi xo zî eskerî de deyîre wenda û helbet semedê ene joy ceza zî giroto.

Notêke bîn zî enowo ke klîbê ene deyîre bî "Klîbo Tewr Serkewte yê Serey 2020'an." Malperey Diyarnamî jurî ke 20 tenî ra hamey pê viraşt, jurî eno klîb zey klîbê sere weçîna.

La wa hendî çi bo? Deyîrek endêke bêro goştarîkerdiş, bibo klîbê sere û bi mîlyonan merdim te ra hez bikero... Ma hendî ma çi wazenê?


Ene deyîre mocna ra ke çiqa karê başî bêrê kerdiş ê karî miheqeq xo rê reyke vînenê, şar wayîr ro ci vecêno.

Ma hêvî bikerê go her serre muzîkarê ma kurdan deyîranê wina serkewte, muzîkêkek bi qelîte virazê û her muzîkê ma raver berê.

Ma notêke qeybî Hunergeha Welat vacin û temam bikerin: Hunergeha Welat ke Rojava de karê muzîkî kena xeynê ene deyîre henî deyîrê bînî zî viraştê û ê zî serkewte yê. Ê heq kenê ke merdim bawno xebatanê înan ra û wayîr ro ci veciyo.

Ê biwazê goştarî bikerê, lînkê "Nazê Nêrgiza Hewşê" eno yo:

*https://www.youtube.com/watch?v=ytsUbEqIPJo&feature=emb_logo*






# Xwe bide alî, ga hat!

Cemşîd, wê salê biryar dabû, wê here zozanan. Ji ber ku ker an jî hespê wî tune bû, ew jî alavên xwe li ga bar dike û diçe zozanan.

Navê zozanê wan jî Aşê Berêz e. Li Aşê Berêz her cure pincar heye. Jixwe salixên tehma kakvîrk û gargacikan jî nayê dayîn! (li herêma Mêrdînê jê re dibêjin 'dûberan' û dişibin kartolan)

De îcar em werin ser mijara xwe, bê ka di rê de çi hatiye serê Cemşîdê reben.

Li ser rêya zozana derbasoyekî pir bi xeter hebûye û haya Cemşîd jî jê tune bûye. Dema Cemşîd tê ber wê derbasokê, hema ji nîşkan ve lingê gayê wî dişiqite.

Cemşîd li hêlekê bi dûvê ga digire û li aliyekî jî bang li şêx Evdilqadirê Geylanî dike, dibêje 'ya şêx Evdilqadirê Geylanî tu bi hawara min de werî'. Çend caran bang lê dike lê kes bi hawara wî de nayê.

Cemşîd dinihêre ku êdî nikare ga zeft bike, hema dûvê ga berdide û bi dengekî zîz bang dike û wiha dibêje: Evdilqadir xwe bide alî ga hat gaaa!

***Riza Uyar***

# Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bihêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin, ji kerema xwe hûn tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan biweşînin.

•Mamê Mino mamanî
Bi roj bela ye
Bi şev kela ye
Kî dizane ew çi ye?

•Tiştek min heye
Bi roj xulam e
Bi şev xanim e
Hûn dizanin çi ye?

•Tiştek min heye
Şevê razam hewş tijî bû
Sibê rabûm yek jê nebû
Ew çi ye gelo?

***Çavkanî: Mamikên Botanê bi berhevkariya Rênas Xendekî û Dildar Botî***



**Bersivên me ev in:**
1-Nivin, livin
2-Gêzik, melkes, sivnik
3-Stêrk

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par vebikin. De werim em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Kewa qir qut kirin**
**Qira kew qut kirin**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Konê me bi qîrê ve**
**Qîr bi konê me ve**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Kerê boz nav rêz zirî**

***Çavkanî: Pitrûka Zûgotinok ya bi berhevkariya Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Balendeyeke kedî, ji bo goşt û hêkan tê xwedîkirin
3. Arvan 5. Di şer de çûna bi ser dijmin de
6. Hal 7. Paytexta Sûriyeyê 9. Bawermend 12. Çêregeh
14. Ji bo ku 15. Alava ku tiştên dûr nêzîk dike
17. Kurteya Yekitiya Ewropayê 18. Rojeke hefteyê
22. Umîdwar, bendewar

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Reş, bi taybetî ji bo kar û berxên reş re tê gotin
2. Giyayekî di nav genim de
3. Cihê ku genim lê tê hêran
4. Noteke muzîkê 5. Daneke rojê
7. Hunermendekî kurd ku bernameyeke folklorî pêşkêş dikir
8. Serokê mîrîtiyê
10. Pêxemberek
11. Êzing, qirş û qalên ji bo şewatê tên bikaranîn
13. Mirovê ji ser xwe çûyî, paye, bi qaban
14. Hediye, xelat
16. Heywanekî bi fen û xapên xwe tê naskirin
19. Li Misrê çemekî bi nav û deng
20. Fêkiyek 21. Agir
23. Dixan, dûman

Bersiva hefteya borî



# Bijarteyek ji albumên salê

Selim Gokçe

Ji ber pandemiyê sala 2020'an hem li cîhanê û hem li Kurdistanê saleke zehmet bû, lewre zêde xebatên hunerî nehatin kirin. Bi tenê beşek bi awayekî online pêk hatin

Yek ji qadên ku ji ber pandemiyê şikestinek xwar jî muzîk bû. Tevî vê yekê, dîsa jî gelek albûmên bi kurdî derketin û konser hatin lidarxistin. Di vê nivîsê de, li gor xwe, ez ê qala çend xebatên muzîkê, bi taybetî yên li bakur, bikim û playlîstekê pêşniyar bikim.

Agît Işik, di destpêka vê salê de albumeke bi navê 'Hez' derxist û bi wî awayê xwe yê xweser ê strandinê gaveke din bi pêş ve bir. Hêviya min ew bû ku vê albumê zêdetir bala guhdaran bikişanda. Ez ecêbmayî mam ku albumeke ewçend bedew, têsîra min hêvî dikir pêk neanî lê dîsa jî yek ji albumên herî balkêş û cuda bû. Dixwazim bala we bikişînim ser strana 'Çîroka Xwe Bêje'. Li gorî min, ev stran û ev album kêm-zêde çîroka Agît vedibêje. Lê guhdarî bikin û hûn dê heq bidin min.

Piştî 'Hez'a Agit dixwazim qala albuma Rewşanê ya bi navê 'Tov' bikim. Dema min li vê albumê guhdarî kir, berevajiyê gelek kesan, li gorî min stranên gelêrî li deng û awazên wê tên. Her ez li Rewşanê guhdarî dikim wekî ku li stranbêjên jin ên berê guhdarî bikim. Yên dixwazin guhdarî li dengên resen ên kurdî bikin, divê hinekî din bi baldarî li Rewşanê guhdarî bikin. Bo nimûne strana 'Ax Eman'.

Albumeke din a hêjayî balkişandinê jî 'Hêdî Hêdî' ya Rûşen Alkarê ye. Nêzîkatiya Rûşenê ya muzîkê di kirasê xwe de nahewe. Hêdî hêdî, albumeke cerîbîner e; di nav xwe de gelek tiştên nûjen dihewîne û her wiha di dengê wê de gelek detayên xweş hene.

Hevalê me yê Harûn ku ji Koma Rewşan tê naskirin, piştî salên direj, bi albumekê derket pêşberî guhdarên xwe. Harûn bi albuma 'Rev'ê bi me dide xuyakirin ku tu tişt ji wî û ji awazên wî kêm nebûye. Wî dengê xwe parastiye û bi vê albumê re dest bi çêkirina stranên kemilî û xurttir kiriye. Di vê nivîsê de ez dixwazim bi taybetî behsa strana 'Rev'ê bikim ku nav daye albumê. Berî ku Harûn bireve têr lê guhdarî bikin!

Yek ji albumên din ên min bi baldarî li wan guhdarî kir jî albumeke konsept a salê ya bi navê 'Dîsa' ye. Albuma Dîsa ji stranên hezkirî yên Rayoya Erîvanê û bi enstrumanên klasîk hatiye amadekirin. Album bi etîketa Enstîtuya Çanda Kurd-Alman gihiştiye guhdarên xwe.

Ji bilî navên li jor, album û sîngilên salê yên bala min kişandin, ez dixwazim hun jî bala xwe bidin wan.

· Agît Işik, Çîroka Wê Bayê
· Rûşen Alkar, Kêm û Kûr
· Harûn, Rev
· Rewşan, Ax Eman
· Pervîn Çakar, Qimil
· Tara Mamedova, Xewna Giran
· Seyidxan Sevînç, Dîlber
· Mehmet Atli, Morî û Mircan
· Mem Ararat, Xewnek
· Ozan Aktumur, Koçberî






## Li Ranyayê festîvala beyt û heyranokan

Li navçeya Ranya ya navenda îdareya Raperînê 1'emîn Festîvala Beyt û Heyranokan bi tevlîbûna dengbêjên başûr û rojhilatê Kurdistanê hat lidarxistin. Festîval li navenda îdareya Raperînê ji aliyê Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Ranyayê ve hat organîzekirin.

Têkildarî lidarxistina festîvalê Rêveberê Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Ranyayê Osman Resûl wiha got: "Me pêwîstî pê dît ku di rewşa niha ya başûrê Kurdistanê û Iraq tê re derbas dibe em festîvaleke bi vî rengî li dar bixin. Gelek stranbêj û heyranokbêjên ji başûr û rojhilatê Kurdistanê tev li festîvalê bûn. Ev yekemîn festîvala beyt û heyranokan e li Ranyayê tê lidarxistin. Em ê hewil bidin di dema pêş de jî festîvalek ku ji her çar parçên Kurdistanê hunermend beşdar bibin li Ranyayê li dar bixin."

Hunermend Selah Xezerî yê ji bajarê Mahabada rojhilatê Kurdistanê tev li festîvalê bûye jî got; "Gelê kurd xwedî ziman û çandeke dewlemend e. Her deverek xwedî taybetmendiyeke xwe ya cuda heye. Li başûrê Kurdistanê hunera kurdî ber bi lawaziyê ve diçe. Bi taybetî beyt û heyran gotin li Başûrê Kurdistanê hatiye paşguhkirin." *RANYA*

# Xebatên Saziya Zimanê Kurdî

Evîn Hesen



Hewildanên avakirina Saziya Zimanê Kurdî ya li Rojava, sala 2003'yan dest pê kirin, lê ji ber zext û gefên rejîma Sûrîyeyê derfet nebûn ku sazî bê avakirin. Xebatên perwerdeya bi zimanê kurdî di malan de, bi awayekî veşartî dihatin kirin. Di sala 2007'an de hin rewşenbîr û zimanhez li hev kom bûn û biraya avakirina SZK'ê ragihandin. Piştî vê yekê êdî xebatên ji bo sazîbûnê hatin kirin, lê ji ber zextên dewletê dîsa jî xebat veşartî dihatin kirin.

Perwerde di malan de hatin dayîn. Li taxan komên biçûk ava bûn û fêrî xwendin û nivîsîna zaravayê kurmancî bûn. Ji bo fêrkirinê hin pirtûkên wekî hînkeran hatin amadekirin. Vê rewşê heta sala 2011'an dewam kir. Sala 2011'an ji ber ku li tevahiya Sûriyeyê şer û şoreşê dest pê kir, ev ji bo Saziya Zimanê Kurdî bû derfetek ku li tevahiya bajarên kurdan navend vebibin, di heman demê de li paytexta Sûriyeyê, Heleb, Reqa û Girê Spî jî xebatên zimanî dan destpêkirin. Bi vekirina navendan re saziyê dest bi perwerdeya dilxwazên kurdî kir, beşeka baş ji civakê hat perwerdekirin, mamostayên zimanê kurdî hatin amadekirin. Derfet bi dest ket ku dibistanên kurdî bên vekirin, hejmareke baş dibistanên taybet ji bo fêrkirina kurdî vebûn. Hejmara dibistan û mamostayan zêde bû lewra SZK'ê bi piştgiriya Rêveberiya Xweser ya niha Rojava bi rê ve dibe, biryara derbasbûna dibistanên fermî yên li herêmên kurdan ku dewleta Sûrîyeyê tê de bû, da. Çar salên destpêkê kurmancî di dibistanan de bi tenê wekî madeyekê dihat dayîn, lê piştre materyalên perwerdeyê ji bo zarokên kurd bi tevahî bi kurdî hatin amadekirin. Ji ber ku SZK ne navenda pewerdekirinê bi tenê ye, rêveberiya dibistanan hat avakirin û di sala 2014'an de xebatên perwerde û dibistanan radestî Desteya Perwerdeyê hatin kirin.

**Bandora li ser pêşdebirina ziman**

Der barê vê mijarê de rêvebera saziya ziman Viyan Cûdî wiha dibêje: "Dema ku ev qad berfireh bû û li Rojava peymangeh, akademî û zanîngehên bi kurdî perwerdeyê didin hatin vekirin, êdî pêwîstî bi navendeke lêkolînan û lêvegereke van sazî û dezgehan ya ziman û wêjeya kurdî çêbû." Lewra SZK'ê berê xwe da karê xwe yê bingehîn ku lêkolînên der barê zimanê kurdî de bike û sala 2019'an SZK'ê navenda xwe ya lêkolînan vekir. Navend li bajarê Qamişloyê ye, niha xebatên SZK'ê tev bi rêya vê navendê tên kirin, komîteyên girêdayî navendê li herêmên Koban û Cizîrê jî hene.

**Armanca vekirina saziya ziman**

Ji bo armanca avakirina vê saziyê jî Cûdî wiha dibêje: "Armanc ji vekirina vê navendê ew e ku bi rê û rêbazên mîna komkirin, berhevkirin, lêkolîn û lêgerînên zanistî û akademîk xwe bigihîne reh û rîşên ziman û wêjeya kurdî. Ji bin pest û pêkutiya di bin zimanên dagirkeran de mayî derxe. Ji qalibên zimanên din paqij bike û diyarî gelê kurd bike." Ji bo pêkanîna vê yekê jî erk û berpirsyariyên SZK'ê yên bingehîn ew in ku xwe bigihîne her kesê, sazî û dezgehên bi ziman û wêjeya kurdî ve bilî dibin. Wan li dora dirûşma 'Zimanê Me Nasname û Hebûna Me ye' bîne cem hev û bi vê yekê cih û lêvegera zimanê kurdî ava bike.

Hewla saziyê ew e ku ji bo tavahî sazî û dezgehên Rojava yên bi kurdî diweşînin bibe lêveger û çavkaniya bingehîn. Ji bo vê yekê pirtûkên rêziman û rastnivîsînê û ferheng tên amadekirin.

**Xebata bi parçeyên din re**

Ji bo têkliya bi parçeyên din re Cûdî tîne ziman ku Têkiliyên wan bi hin sazî û kesayetên her çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welatî re jî hene û wiha dibêje: "Em dixwazin van têkiliyan berfireh bikin, da ku bi hev re bigihin standariyekê ji bo zimanê kurdî. Armanca me ya serke, bipêşxistin û pêşvebirina ziman e û xwedîderketina li wêjeya kurdî ye. Sazî hewil dide ku ji bo standariya kurdî xebateke bi şûd bikin."

**Awayê lêvegera xebatan**

Rêvebera saziyê Viyan Cûdî ji bo lêvegera xebatan agahî dide û wiha dibêje: "Lêvegera me, em tevahiya pirtûkên heta niha bi kurdî hatine amadekirin ji xwe re bingeh digirin, bi vê re jî çavkaniyeke me ya sereke civak e. Pirtûkên diyar tune ne, em li hemû berhemên ku di destê me de hene vedigerin."

**Xebatên taybet û yên giştî**

Cûdî di berdewama axaftina xwe de der barê xebatên saziyên de wiha dibêje: "Xebatên me yên giştî di nav du komîteyan de hatine dabeşkirin; komîteya ziman û komîteya wêjeyê. Di nav her komîteyê de beşên taybet hene. Di komîteya ziman de karên redekteyê û rêzimanê hatine dabeşkirin. Di wêjeyê de jî komîteya berhevkariyê heye".

Cûdî ji bo xebatên giştî dibêje: "Em amadekariyan dikin ku ji bo tevahî sazî û dezgehên Rojava yên bi kurdî diweşînin; çavkaniyan amade bikin, çavkaniyên wekî Ferheng û pirtûkên rêziman û rastnivîsînê."

xwebûn

28 Kanûn 2020 -3 Çile 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 54

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85


# Sersala we pîroz be!

Gelê kurd û gelên Rojhilata Navîn û gelên cîhanê me saleke biêş û jan, bipêkutiyên siyasî, lê di heman demê de bi têkoşînê tije li pey xwe hişt. Em dikevin saleke nû û her sersaleke nû di heman demê de hêviyeke nû ye. Têkoşîna dîlên azadiyê, gelê kurd û hogirên wan a li hemberî tecrîd û pêkutiyan jî berdewam e. Têkoşîna gelan a ji bo demokrasî û avakirina jiyaneke birûmet, wekhev, aram û azad jî didome.

Bi hêviya ku sala nû ji bo gelê kurd û hemû gelên cîhanê bibe sala aştî, azadî û demokrasiyê, bibe sala pêkhatina yekitiya neteweya kurd, em sersala hemû girtiyên di zindanan de û gelê xwe pîroz dikin.

MED TUHAD-FED

Federasyona Komeleyên Piştevanî û Hiqûqê ya Malbatên Girtî û Hukumxwaran a Med'ê